


DUGIR

Her sê mehan carehê derdikeve • Adar 1997 hejmar





DUGIR

HEJMAR 6, 1997, HER SÊ MEHAN CAREKÊ DERDIKEVE

KOVARA KURDÎ LI DERVEYÎ WELÊT
EV KOVAR LI GOR ALFABÊ, VEKÎT Û RÊZIMANA
MÎR CELADET BEDIRXANÎ DERDIKEVE

XWEDÎ
Kawa förlag

Berpirsiyarê giştî
Dr. Saîd Mele

Birêvebirên kovarê
Ehmedê Huseynî
Zagrosê Hajo
Yehyayê Yûsif

Berpirsiyarê hunerî
S. Rêzanî

Abonetiya salekê
200 SKR

Adres
DUGIR
Box 3437
165 23 Hässelby
SWEDEN

Posta elektroni
zagros.hajo@avesta.
mail.telia.com
Tel/faks
46(0)8-6211571
tel.46(0)706333261
faks 46(0)22653472

Postgiro
692357-7

ISBN: 1400-5913
Çapxana APEC

NAVEROK

- | | | |
|----|---|----------------------|
| 2 | Pêşgotin1..... | DUGIR |
| 3 | Pêşgotin2..... | HENDRÊN |
| 5 | Çend dîmenên xerngîn..... | EHMED HUSEYNÎ |
| 12 | Geryanek li Mem..... | TENGZARÊ MARÎNÎ |
| 15 | Ji dîmenên Cenga mezin..... | SEBRÎ BOTANÎ |
| 25 | Lêkolînek li ser govenda Şêxanî..... | BEŞÎR BOTANÎ |
| 28 | Helbesta Andre Breton..... | ALAN JOUFFROY |
| 34 | Çarşema xweliyê..... | T.C. ELIOT |
| 40 | Rêvingî, bîranîn û mirin..... | YÛNIS ELHEKÎM |
| 43 | Di terkên demê de..... | YÛSIF CERIHÎ |
| 45 | Nameya dilekî bikul..... | MEHMÛD IKO |
| 47 | Yara neyar..... | DILYARÊ DÊRIKÎ |
| 49 | Leşker..... | JÎ FOLKLORÊ FÎNLANDÎ |
| 56 | Ji helameta stêran dakeve..... | M.JÛRÎ |
| 58 | Behremê Hajo..... | Dr. DIETER BUTER |
| 64 | Listeya peyvên ji pênuşa Mîr Celadet Bedirxan | |

- Nivîs eger çap jî nebin, li xwediyan nayên vegerandin.
- Ji bilî naverokê, di serastkirina nivîsan de Dugir azad e.
- Ji bilî nivîsên ko li ser navê Dugirê tên weşandin, her nivîs-karek berpirsê naveroka nivîsa xwe ye.

Pêşgotin 1

Çanda me, çanda şkestin û beravêtin û baskokirina xewnê ye, hemî sîma û wate û dîmen û reng û çêj û amajeyên xwe ji herifîna hêlînan û ji rûreşkirina heyvên arezû û bendemanê, werdigire. Hişê vê çandê, qonax û kûrahiya wê û hemî şeweyên derbirîna wê ya kevn û nû, mîratgirên êş û şîngirîyan in. Têkçûn in, xwekuştin in, bêrîkirin û dilsojî û şewat û giryan û ji dayilbûna pîrsên şikestî yên bê bersiv in..

* Geh bi hêminî û geh jî bi dijiwariyeke bêmînak, şûnşopên xwe, sosretên xwe, talan û metirsî û naveroka mirinên xwe, li ser lêvên peyvê, li ser dêmên xêz û rûpelan dikolin.

* Li vir û li wir!

Xewn, alên sor ên dabeşkirina laş û giyanê xwe radestî rakêşana şevistana dîrokê dike.

Em jî, li ser keviya tûj a ceografya qonaxê, bê pend û bê hozan, bê şîretmend û şopgerîn, bê mûm û rojçêbûn, berbi termê xwenê ve sernîşîv dibin.

* Dar, avjîn û keskahiyê, xuşîna xweşiyê dikuji!

* Baran, kelekên sermest û hêlanên zaroktiyê, bîna gîha û dastanên şevbuhêrkan dikuji!

* Evîndar, rûpelên dilovanî û sergêjahiya pinpinîkan, heyvên çardeşevî û bîna ximavê dikuji!

Çanda me jî, westyayî, bîncikyayî, çavriyyayî, serberdayî, û matmayî jî, ji çemê xweliyê derdikeve û berbi goristanan ve da ko lawik û sirûd û heyran û dîlokan li miriyan belav bike, da ko tembînameyan û nameyên derengmayî diyarî kêlên bêdeng bike, diçe.

* Xewn qesasê serê xewnê ye!

* Peyv pîvana serjêkirina gulê ye! Çand xwe dadiweşîne, xwe ji tevn û toza dîrokê rizgar dike, hildiperike keskesora jiyanê, berbi îstgeh û bendergeh û seyrangehên evîna xwe ve tê.

Tê... Tê, li ser devê rê, pêrgî sêdar û serbirên xewna xwe dibe!

* Welat bê çav e, digirî.

* Esman bê ewr e, digirî.

* Zeman bê çerx e, digirî.

Xewn jî li ber baranê, gulebaranê himbêz dike.

Çavên xwe di mirinê de ji bîr dike. Sîbera xwe dadiqurtîne û mîna hemî qehremanên dîroka çîyan û deştan, berbi wêranê ve, berbi wêrana têkçûna zemîn û zimanê xwe ve, berbi bîra bê bîranîn ve, berbi gurmîna gumanê ve, dikulkule, . Ziman hêza dawî ye!

* Xewn jî di ferhenga sedsala me ya lal de, peyva herî bawî ye?!

Dugir

Pêşgotin 2

(Pêwistiya me bi rêbazekê heye; rêbazeke ko bikaribe astengên me ji me re eşkere û ron bike, cihêwaziyên me biafirîne û demê jî berhemdar bike)

Gilles Deleuze

Têgihiştina nivîsandinê wek çemk (concept) têgihiştina aferandina pirsan e û di sewiyeta avakirin û dagirtina valahiyan bîr û yadwerî û dîrokê de têgihiştina bi karanîna ye. Ev têgihiştin û ev bikaranîn jî şeweyek ji şeweyên geşbûn û pêşveçûna hebûna kultûrî û xwenasîna ne û beşdarbûna seqa û cihanên pirsên hemdem e; pirsên ko li çarenûsa mirovatiyê digerin Dema em hewl bidin vê têgihiştinê, wek erkeki serekî, di jiyana xwe de û di hemî warên cihêreng ên civaka xwe de bikarbin, bêguman, bi wê hewldanê em dê awez (aqil), hişyarî û agahiyeke mêjûyî biafirînin.

Regeza bingehîn a vê hişyariya mêjûyî: Bîr û bîrewerî, nasname, çand û kultûr- di gorepan û meydana çanda navnetewî de xweçesipandin e. Arezû û xwestekên ko agahiyê (consciousness) û vê avahiya hişmendiyane yî agahdar dadimezirînin peywendî ne; peywendiyên laşê cî û demê ne: Reng, bîn, hiş û bîra bizavkar û zindî ya ko em pê hatine bişafîtin û bistirînin.

Wisa, regez dibin nîşan (symbol), dawî jî di têgihiştina agahiya me de bi cî dibin..

Nîşan jî (cî, dem, reng, bîn, hiş û bîra zindî) wek xeyaleke taybetmend me dehf didin ko careke dî em li wan bigerin, da ko nemir bibin. Ji xwe ev hest bi xwe- wek dudilî û saw û velerzîn- me amade dike, da em bibin xwedanên bûneweriyeke çandeyî.

Stûna bingehîn a vê bûneweriyê ligor Haydger ziman e (ziman dilê bûneweriyê ye).

Li vir, pîrsa kultûrî hewldana digel dîrokê- angî dilê bûneweriyê- damezirandin û çekirina peywendiyê ye ne ko jêdûrkrîtin û dabirîn e, çînkî jî dîrokê bi dîrkrîtin û dabirîna peywendiyên derçûna ji bûneweriyê ye; bi kurtî xwekuştina xwe ye.

Serencama vê prosesê jî_ ji dîrokê bi dîrkrîtin û jê cihêbûn- windabûna bîranîna ye angî nema bi bîrhatine, bi bîrmetî li xwe temaşekirin e û xwe riswakirin e..

Bi vî awayî awez (aqil) wînda dibe, wîdabûna awez jî wîdabûna bîra dîroka mirovatiya me ye. Hestkirina bi hebûna vî awezî angî hebûna pîrojeyeke ramanî ye; raman jî verijandina tiştan e.

Erka nivîskar jî bîrîkirin e; bîrîkirina xwe nêzîkahiya berbi dîroka bîrê ve ye û parastin û perestîya wan nîşanan e; nîşanên ko hem di kûrahiya laşê wî de dihêwirin û hem jî laşê wî pêktînin.

Hewldana me axaftina bi
afirandina vê bûneweriyê re ye, ji
nû ve û bi şêweyekî dîtir
vejandina wê ye, da ko bi
serbilindahî henasê (nefesê)
bikêşe.

Lê diyar e ko koçbariya xewnên
me; xewna bi civatê, bi cemawer,
bi kurdewariyê û bi gelê kurd, li
ser duryan û rêçên partiyên me,
rêçên xwe winda kirine.

Ev windabûn wa li me dike ko em
dîroka hiş û bîra xwe serjêkirî
dibînin.

Reng e awezê (aqilê) me bi xwe
hişê xwe winda kiribe yan jî bi
dawî hatibe.

Ko xewn nemîne şer dest pê dike.
Şerê îro jî berî her tiştî laşê me
dikuje.

Kuştina lêş jî kuştina xewnê ye.

Beşdariya nivîsandinê di
gurkirina şer û kuştina lêş de, me
li hemberî pirseke tirsnaq datîne.
Pirsa ko hema hema wextî
têramandina aqilê me rawestîne.
Nexwe bêrîkirina ko em li ser
peyivîn, me jî bîr kiriye(!).
Di hundirê gergerînek û labîrînta
şer û pevçûnê de em dergehên
rizgariyê winda dikin.
Lewra projeya ji xwedexisîn û
riqlixwebûnê dest pê kiriye.

Di vê bareyê de û di vê rewşê de
jî, em ceografiya wan nîşanên ko
hebûna me ne, berbi û berbi nava
ceografiyayên rengên şerên

partiyên hişkuj û xewnkuj ve
diguhêzin.

Di vê pêvajoya kujdar de, nivîskar
xewnan dakuje û di heman wextî de
nivîsandinê jî dakuje.

Bêdesthilatkirina nivîsandinê
bêdesthilatkirina nivîskar bi xwe ye jî
çunkî di vê rewşa malkambax de,
nivîsandin ne dibe û ne jî dikare bibe
alava berhemdayîna awezê berhemdar,
ango aqilê ko ramanê diafirîne.

Ev diyarde, li hemberî partiyên me
yên xewnkuj û di çarçewa alîgirî û
dabeşbûna li ser sînorên vê hêzê û wê
hêzê, diyardeya nivîskarê kurd e..

Pirsa bîr û hiş û bûneweriya vî hişî
bixwe, pirsa nîşan û hêma û
nasnameyê, pirsa bîn û reng û
kesayetiyê, di berhemdayînê de, ji
bîrbûyî ne.

Ji bîrkirî ne



Hendrên

ÇEND DÎMENÊN XEMGÎN ÊN KURMANCIYA NIVÎSKÎ



EHMEDÊ HUSEYNÎ

Eger armanca weşangeriya kurmanckî bi giştî, û bi taybetî, eger çapkirin û belavkirina pirtûk û kovarên wêje û hunerê, tenê, ji bo weşandin û reşkirina rûpelan, û bi navê parastin û nûjenkirina zimanê kurdî, xwepêşandaneke kawikane û qayîşkêşaneke gundiyaî bêhavil bit, eger di vê serdema serberdayî de, prosesa weşanê nikaribe angoyên hebûna xwe, mebest û egerên peydabûn û birana(burhana) pêwistiya xwe, wisa ronak, êşkere û bi zimanekî rewşenbîraneyî têr aferandin, têr zanîn û raman, wergerîne qada hişyarî û hişmendî û peyivîn û ragihandinê, û nikaribe rêçên lêpîrsîn û guftûgoyan di sînorên pêdivî û pîrsgirêgên çanda kurdî de biqelêşe, wê çaxê pîrsine giring û balkêş, û gelek caran tîrsnak jî, di hişê mirovan divejin. Hemî pîrsên ko divejin jî, di serencama xwe ya dawîn de bi sewiyeta rewşenbîrê kurd ve girêdayîne û li ser rolên wî yên siyasî û civakî û şaristanî gumanên rehdaçikyayî pêşkêş dikin.

Di vê qonaxa hestdar de, piştî awqase sosretên ko bi serê kurmanckî hatine û hêjî berdewam in, rewşenbîrê kurd hem wek goveyê(şahidê) wan sosretan û hem jî wek projeyeke kultûrî yî raperînxwaz ko dixwaze navroka zimanê xwe berbi hunerên derbirînê de rakişîne, pêwiste tu carî ji asta gumanê danekeve; gumana li ser strûktûrên rasteqîn ên paydabûna wî; gumana li ser ronakî û paqijî û zelaliya hestên wî, gumana li ser qurmiçandin û lawazkirina kesayetiya wî ya dîrokî û gumana li ser raman û bîrûbawerî, nîrx û stûnên nasnameya wî ya netewî. Ango gumana li dijberî bêgumaniya reha (mutleq). Çinkî tenê bi himbêzkirina tovên gumanê bizav dikare li hemberî rawestanê, û rêjeyî (nisbî) li hemberî rehayiyî, pêşveçûn li hemberî bi çûndemayîne, rawestin. Û rewşenbîrê kurd jî di vê sewiyetê de dê bikaribe dest bi vejandina gencîneya ko di hinavên kurmanckî de veşartîye, bike. Dê bikaribe li hemberî prosesa asîmîlasyonê erkên xwe yên dîrokî bi karbîne, ne tenê dê bi zimanê xwe binivîsîne lê dê xwîneke nû û hêrseke

teze û angoyeke dolmend û nîşan û amajeyeke dahênane pêşkêşî zimanê xwe bike. Herwisa dê bikaribe di cîhana zimanê xwe de asoyên nûjen, dîdarî û awirên surdar û mat û sersom jî veke.

Wexta ko nivîskarê kurd li zeviyên gumanê bigere û asoyên gumanê ji boyî firîna xwe hîlbijêre; wê wextê dê ji bilî pirsan bi tu tiştî mijûl nebe. Û hemî bareyên mijgirtî yên cîhana peyva kurdî dê her û her sawa wî berfirehtir bikin, dê her û her jî wî dehî bidin, ko vê sawê, di çêsnê pirsine çarenûsane de biafirîne:

Dê pêşkêşkirina naveroka sawê û ji ser pêşeniya çanda kurdî dawêşandina tozê, wek erk û berpirsariyeke dîrokî û rewşenbîrîyî wijdanî bibîne. Bi heman bîrûbaweriyê, dê hewl dide, ko li kesayetîya windayî ya zimên bigere û di çarçewa hişmendiya netewî de, hestên beravêtî û lawaz, ji nû ve, bi laşê zimên ve girê bide.

Bi xwesipartina ser jîndarî û kûrahî û çalakiya zimanê netewî, hebûna rastîn û kesayetîya rehdaçikyayî ya mirovan, herwiha di dîrokê de berdewamî û heyîna civatan ji windabûnê têne parastin. Her kes wek endamê civateke netewî, dikare, eger û merc û sedemên berdewamiya hebûna xwe ji berdewamiya hebûna zimanê xwe yê netewî-zikmakî wergire. Dîsa, her kes, rastiya bûneweriya xwe ya civakî, siyasî, dîrokî, çandî û şaristanî ji rastiya hevgerî û dolmandî û ji radeya çesipîn û berfirehî û şiyana guncîna zimanê xwe digel pêşveşûn û pêdiviyên serdeman, bi dest dixîne, û li bin perên vê bi destxistinê bixwe, dikare, xewnên xwe, cîhana xwe ya giyanî û formên xweşik ên nasnameya xwe û di çarçewa mercên mirovatiyê de; mirovatiya xwe ya teybetî, bi karbîne.

Bi alîkariya zimên- ziman wek bûnewerekî bi laş û bi giyan û wek alava seretayî ya têgihiştin û derbirînê- bîr û baweriyên kevin û nuh ên civatê, rewîşt û gerdîşe, vemayî, mîrat û kelepör, dîrok û ol û felsefe, raman û lojîk, tore û huner û pîşe û alav, gêwil û rengvedanên derûnî- psîkolojî, xwe nêzîkî hevdû dikin, û bi hev re, çand û rewşenî û kûltûra wan xelkên ku bi (vî) zimanî yan bi (wî) zimanî dipeyivin, pêktîne, dadimezirîne.

Bi kurtî, ziman pencereya herî pîrozane ya hebûna mirov e, di wê pencereyê re mirov dikare li dorhêla xwe û li gerdûnê jî temaşe bike. Ziman (ez) a mirov e, (ez) ek e bilind û payedar e, bêtîrî (ezê) ne mirov dikare nêrînên xwe li ser tiştan durist bike û ne jî dikare bîr û baweriyên idyolojî damezirîne.

Wek ku Haydger (Martin Heidegger) dibêje: *ziman xaniyê bûneweriyê ye*. Ji destpêka vê sedsalê; ko dagîrkirina kordistanê dimenên xwe yên siyasî û ceografî wergirtiye û hetanî vê kêlîkê, ti carî, proje û planên hewldana ji holê rakirina nasname û taybetmendiya kesayetîya mirovê kurd ranawestiyane. Di vê hewldanê de, û di pêvajoya tevgera berxwedana gelê kurd ya ji bo bidestxistina mafê netewî de, renga, zimanê kurdî ji her tiştî

bêtir hatibe pelçiqandin, herwisa renga ko zimanê me mezintirîn û payedartirîn şehîdê berxwedana gelê kurd be.

Digel ko gelê kurd, li beramberî êrîşên hovane yên ku dixwestin nasnameya wî talan bikin, di serencama dawîn de, şiya wê nasnameyê biparêze jî, lê dîsa hetanî radeyeke balkêş û tirsnaq, zimanê serdestan bi alîkariya dibistan û alavên ragihandinê û pronameyên taybetî û dijwar, dikarîbûye (mebesta min zimanê serdes e) cihê xwe di hest û nest û têkperîn û hêrs û jiyana giyanî ya mirovê kurd de çêbike. Bi gotineke dî, di şûna ko gerek zimanê kurdî wijdan û hiş û hişmendî û hizra mirovê kurd dameziranda, dibe zimanekî biyanî û mirovê kurd jî li hemberî zimanê dayika xwe di mişextî û namoyiyeke tundî dijawar de diji.

Li vir, perwerdeyiya li jêr desthilatdariya dagîrkeran, rêbaz û çand û şaristanî û dibistanên veguheztina fermanên zimanên birêz û rêzداران dest pê dikin. Zimanê kurdî jî dako piçekî ji rûmeta xwe biparêze, ta radeyekê, di peywendiyên rojane yên di navbera binemalan de bi cî dibe.

Sê şaristaniyên cihêreng, bi alîkariya sê zimanên cuda, berbi giyanê mirovê kurd de diherikin da ko birîna zimanê wî kûrtir bikin. Û serencam, zimanekî nû ye. Dabirîna hebûna antolojî ya mirovê kurd e. Di civatê de Jihevixistin û lerizandina cîgehê zaroktiyê ye. Li kêleka lêş kuştina hest û giyan e.

Ji bo ronîkirina vê xalê bi xwe û ji bo berbiçavkirina çend pirsên pêwist ko dê bihingivin cîhana wêjeyî û rewşa kurmanckiya nivîskî ya îro, ez dixwazim bi kurtî li ser çend dimenên xemgîn ên ku bi rastiya derbirîna zimên ve girêdayîne rawestim.

Wek ku tê xuyanîkirin, roj bi roj, cîhana rewşenbîrî û çandeyî ya ko xwe bi zimanê dayikê derdibire, ji alîkî ve berfirehtir dibe û ji aliyê dî ve jî tevlihevtir û aloztir dibe.

Di avakirina vê cîhanê de, her kesê ku dikare bi kurdî bixwîne û binivîsîne, bi hêsanî beşdarî nîgarkirina dimenên wê dibe. Di vê bareyê de, rê li ber berpirsariya wijdanî û dîrokî, ast û sewiyeta têgihiştin û zanîne, pîvanên neskirî yên dahênan û afirandin û hunerê, bi navê vejandin û dolmendkirina kurmanckî wek ziman û wek pirtûkxane, tê girtin. Bêguman, zimanê kurdî zimanê gelê kurd e, lewra mafê her kurdekî heye ko bi zimanê xwe bixwîne û pê jî binivîsîne, dikare ji bo bidestxistina vê erka pîroz hemî jiyana xwe terxan bike, lê dixwazim bidim xuyanîkirin ko daxwaz û arezû, xewn û xwezka tiştek in û realîteya ku îro li berdest û li berhest e tiştekî din e. Mebesta min ew e, ko ne tenê bi nivîsandina kurmanckî mirov dikare merc û pransîbên welatperwerî û niştimanheziyê wergire. Eger wisa bit, pêwist e hemû gelê kurd nivîskarê kurmanckî be. Ango mirov dikare cawfiroş û gulfiroş be lê di heman wextê de mirovekî qenc û hêja, bi rûmet û dilovan, welatperwer û hest tenik be jî.

Piraniya kesên ku bi nivîsandina kurdî mijûl dibin, di hevpeyivîn û di gelek kovaran de didin xuyanîkirin ko nivîskariya wan ji bo parastina zimanê kurdî ye, ji bo vejandin û ji nû ve bikaranîna vî zimanê bi şûndemayî ye. Dêmek eger zimanê kurdî di sewiyeta zimanên dîtir de bûya dê xwe nêzî cîhana nivîsandinê nekiribana!?

Nivîskarên kurmancî (helbestvan, romanivîs, çîroknivîs, zimannas, rexnegir!) yên ko îro xwe wek xwedî û berpirsyar û xemxurên ziman û wêje û çanda kurdî dibînin, di zaroktiya xwe de, li dibistanê, bi zimanê xwe yê zikmakî nexwendine.

Ango, ti kes, bi rêk û pêkî û bi rêzanî, bi awakî zanistî û hişyariyane, hînî zimanê xwe yî ko îro pê dinivîsîne, nebûye.

Wek serencama vê nehînbûnê û di bin bandora wê de, valahiyeke bê ser û ber, kûr û berfireh, di navbera mêjî, hest û nest û alavên derbirînê û di navbera rastiya nivîskariya bi kurmancî de, peyda bûye.

Herwisa vê bandorê bixwe xeleka bingeîn û seretayî û kilîta sewiyeta guftûgoyên pêwist yên li ser strûktûrên şaristanî û civakî û psîkolojî yên ku beşdarî damezirandina kesayetîya rewşenbîrê kurd bûne, bi xwe re winda kiriye. Ji ber ko, li ser rawestan û têramandin û ronîkirina vê bandorê ji hundir ve dikare bibe pileya yekemîn a pêşkêşkirina çend pirsên mezin û çarenûsane ko di dawîya dawî de dê bihingivin rastiya nasnameyê, kesayetî û dîrok û hestên netewî jî; ne tenê yên rewşenbîrên kurd lê yên mirovê kurd bi giştî (wek hebûn û şaristanî û projeyeke çandeyî) ku di çarçewa zimanê xwe de -mebesta min mirovê kurd e- mirovekî nexwendewar e.

Bi hînbûna zimên di dibistanê de yê zarok- şagirt dikare hêz û şiyana li ser peyvê rawestan û bi hûrbînî lêtemaşekirinê, wergire.

Di wan salên seretayî de, di wê dibistana pêşîn de, mêjiyê zarok hînî pirsan dibe, rastî û çewtiyê ji hevdû cihê dike û bi hiştûjî; bi alîkariya rêzîmaneke rastîn, dest bi çêkirin û avakirina hevokan dike.

Di dibistanê de, ko pêngava seretayî ya hişyariya zimanî dest bi ji dayikbûn û fetiqaandinê dike, hest û nest û têkperîn û gêwlê zarok jî di çarçewa vî zimanî bixwe de dest bi avabûn û geşbûyînê dikin; bi laşê zimên ve tîr girêdan û di şaristanî, dîrok, çand û bîrûbawerî û kultûra vî zimanî de jî tîr bistirîn û bişafîtin.

Nivîskarê kurd (kurmanc), Ji bilî hemî helbestvanên kurd ên ko ta niha helbesta Cegerxwîn dûbare dikin, ko di çarçewa bar û doxên civakî û dîrokî de; xwedan hestine zelaltir in, û di berhemên wan de, şopa bandora hînbûna zimanê dagîrkeran, di warê derbirîna peyva resen û zikmakane de nîne, zimanê xwe yê zikmakî ji malê û ji kolanê wergirtiye. Ev wergirtin bi awakî rimikî (xerîzî), ji ber xwe ve û hetanî radeyeke balkêş bêyî agahdarî pêk hatiye. Wisa eger em li ser wan nivîskarên ko bi mezinahî (20-25 salî) hînî axavtina (ne nivîsandina!) kurmancî bûne, nepeyivin.

Rast e, ((ziman wergirtin mirov digihîne pileya fêrbûn û bikaranîna rojane ya zimên, lê dibistan û hînbûna di dibistanê de rewşeke dî diafirîne, ku mirovan digihîne asta zanîn û nasîna dirustî û rast bikaranînîna wergirtinê.)) Dîsa di dibistanê de, mirov hînî rêziman û rastnivîs û nermahiya danûstendina bi zimên re dibe, çînkî rêziman ne hema alava derbirîna ramanan e, lê ew bi xwe_rêziman_ramanan çêdike û bi gewde dike jî. Ji ber ku ((çêkirina ramanan ne prosesek serbixwe ye, na, ew bi xwe jî beşeke ji rêzimana zimên))

kormanciya nivîskî ya îro serencama xuristî ya vê bareyê(haletê) ye. Nivîskarê kurd jî eger nivîskarê zimanê kurdî be gerek serencam û derçûnê herî ronak ê bareya wergirtina zimên be. Ji xwe pirsê serekî li vir dest pê dike: Ma nivîsandin, wek huner, bi zimanekî wergirtî çêdibe yan na? Ez vê pirsê hetanî ku xweşmêrekî nivîskar (nav di xwe de bide) û ji me re ta bi derziyê ve ke, vekirî dihêlim!!

Jixwe eger em bixwazin vê bareya malkambax ji çarçewa nivîsandinê rakişînin realîteya dabeşkirina ceografya û formên sînor û dorpêçkirina gelê kurd, dê rewşa çanda kurdî, kesayetiya resen û dîrokî ya mirovê kurd, awayên perwerdeyî û geşbûyîn û duristkirina hişmendyane ya rewşenbîrê kurd bi taybetî, hem zelaltir û hem jî xemgîtir, diyar bibin. Li vir pirsên bingehîn ên hebûnê, û lixwemikurhatina rasteqîn a rewşenbîr û nivîskarê kurd, û asta balkêş û tirsnaq a guftûgoya çarenûsane, dest pê dikin. Ango pirsên di çêsnê gurmînê de ko dê sergêjahiya melevanê peyva kurdî rawestîne, û dê bikaribin asoyên nû û teze li ber pirsgerêkên dîrokî û siyasî û rewşenbîrî jî vekin:

- ♦ Hetanî kîjan radeyê, li dijberî çanda tirk û ereb û farisan, me çanda xwe ya netewî parastîye?
- ♦ Cihêwazî û nakokî û sê formên cihêreng ên danûstendin û rabûn û rûniştina kurdan ko ji xwarin û cillixwekirinê dest pê dikin û li cem têramandin û hişmendî û awayên derbirînê ranawestî, ji kûderê hatine?
- ♦ kurdê ko çanda xwe, kultûr û zanîna xwe ji destê diwemîn wergirtiye, hetanî kîjan pileyê şiyaye hokar û regezên kurdewariya xwe û kultûra xwe ya neteweyî biparêze û jiyana xwe bi heman kultûrê berdewam bike û di çarçewa aferandinê de wê kultûrê derbibire?

Weşan, pirtûk, berhem û nivîskarê kurd ê ko bixwaze ji dil û can, di vê qonaxa hestdar û tirsnaq de, ji xwe re, hem roleke dîrokî damezirîne û hem jî beşdarî avakirina dîmena giştî ya çand û peyva kurdî bibe, gerek berî her tiştî hewl bide ko li beramber û li dijberî zimanê êlê, zimanê kerî û zimanê jihevketî yê kolana ko di merc û barûdax û seqayên(etmosfer) sexte û qelp de hatiye perwerdekirin, raweste. Wî zimanî ji toz û bandora dîrokî dawêşîne, bêjing bike, zelal bike, biparzinîne.

Nivîsandina wêjeyî, aferandina hunerî û statîkî, eger angoyeke zelaltir û mebesteke piralî û hokarên nû yî rehdaçikyayî û qublenameyeke jêpiştrast pêşkêşî zimên nekin, dê, ew nivîsandin û aferandin, wek serencamîne bêguman, careke dî dúbarekirina zimanê berdest be, dê dúbarekirina realîteya naskirî ya dîrokî û civakî be, realîteya ko bi sedsalan dîmenên wê ji alî dagîrkeran ve hatine nîgarkirin û parastin. Di çarçewa dîroka "kurmancî" de, dê ji nû ve ragihandina barûdixên siyasî û bi bîranîna proje û planên sedsalane yî hovane û trajîdya qedexekirin û gemkirin û afsaneyê berxwedan û xweparastina kurmancî bixwe be jî.

Wexta ku nivîsandin ziman zelal bike, naverokekê pêşkêşî ezmûneya nivîskarê kurd dike; berya ku ev naverok naverokeke navnetewî û mirovî be, dê naverokeke taybetî takekesî(ferdî) û netewî bit. Ango wêje û nivîsandin, di vê sewiyetê de, dê formekê pêşkêşî jiyane bikin, mebesta me jiyana mirovê kurd e. Bi alîkariya vê formê, em dê xwe, hest û nestên xwe û mebesta hebûna xwe, erk û pêdivî û berpirsiyariyên xwe yên wijdanî û şarestanî nas bikin.

Ev proses ne bi nivîsandina deqên hêsan û sade û ne jî bi xwesipartina têrm û hevokên wergirtî, û ne jî bi xwepêşandan û xwerekpêşandin û di zemîna peyvê de bi xwedúbarekirinê, pêk tê. Lê pêkhatina durist a vê prosesê bi kûrkirin û berfirehkirin û dolmêndkirin û asovekirina amajê û xeyal û hizrên berz û sihr û aheng û harmoniyeke derûnî, dest pê dike. Bi kurtî, eger em di wê baweriyê de ne, ku êdî kurmancî dest bi xwenivîsandinê kiriye, gerek em bikaribin, bi vî zimanî, ezmûneyên(tecrûbeyên) xwe, hem wek mirovine rewşenbîr û hunermend û neynikên rengvedana qonaxên dîrokî yên gelê xwe, û hem jî wek mirovine giştî ko di cih û demeke taybetî de dijîn, bi şeweyekî ciwan û xweşik û giranbuha û hunerane pêşkêş bikin, çinkî mezintirîn tawanbarî li dijî civatê ew e ko em ezmûneya wê civatê bi alavîna sexte û bi behreyên(mewhîbet) lawaz û riswa, bînin zimên.

(Eger tu binivîsînî, gerek berî her tiştî tu şoreşekê neko di civatê de lê di xwe de, di zimanê xwe de, di nêrîna xwe de, û di nivîsandina xwe de, çêbikî. Adonîs)

kurmancî jî wek hemî zimanên dîtir xwedan bêje û peyvên giştî û naskirî û amadekirî ye.

Bi van bêje û peyvên, mirovê kurmancîaxêv dikare taybetmendîya jiyana xwe ya gelemper û takekesane, hem ragihîne û hem jî derbibire. Her kurmancîaxêvek- ku ne lal be- bi hêsanî dikare bibêje" ez bindest im ".

Rola wêjeyê ya payedar û giranbuha ew e ko bikaribe vê sewiyeta vebêjî û peyvîne derbas bike û zimanê nivîskî jî vê asta giştî ya bikaranîna zimên rizgar bike, ziman berbi asoyên teze de rakîşîne, li dijî bikaranîna prîmîtîv û hevokên westiyayî û fermanên qels û lawaz ên zimanê asa û normal raweste û sînorên nûjen li ber formên cihêreng ên derbirîne(tabîr) veke; angoo derbirîn bixwe kûrtir û diwartir û şarezatir bibe. Di vê çarçewê de, armanca

wêjeyê, daxwaz û arezû û kefteleft û xebata nivîskarê wêjeyê jî, ne dúbarekirina peyv û hevok û wişeyên ko her kes- ji bilî lalan- dikare wan ligor sewiyeta xwe derbibire. Lê nivîskar, madam nivîskarê zimanekî taybetî ye û bi cihana hunerê re dan û stendinê dike, gerek bikaribe tiştên ko nayên bilêvkirin bi lêv bike, tiştên ko nayên bi gewdekirin bi gewde bike, tiştên ko nayên pesnêkirin û wênekirin û saloxdan, bipesinîne, biwênîne û di zewiyên xeyala resen de serperestê saloxdanê be. Ango peyvên û bêje û hevokan, rêxistina naskirî û berdest a zimên bigihîne wê asoya ko ziman bixwe nikarîbû xwe bigihandê, yan jî ziman bigihîne wê qonaxa ko tu carî di pêvajoya xwe de, ziman, ji xwe bawer nedikir, ko êdî dikare bihingivê. "Gerek her gav em bixebitin û şaş bibin, hîn bibin û şaş bibin hetanî ko dawiya dawî em bigihêjin belkoyên(ihtîmalatên)vekirî yê deqekî(text) ko bikaribe pêdarî û berxwedanê bike; ne berxwedana li dijî tang û topan û gulleyan, lêbelê ya li hemberî tiştên tirsnahtir: deqên hêsan, deqên yekalî yê ko ji boyî nixumandina tawanbariyên dîrokê hatine nivîsandin. Haydgar".

Ziman, çî ziman be bila bibe, di cihana derbirîna hunerî de, wexta ku realîteyê wisa qeşartî û êşkere pêşkêş bike, tu nakokiyê di navbera xwe û zimanê rojane û devîkî de nahêle. Çinkî di prosesê dahênan û aferandina deqên wêjeyî û hunerî de, gerek zimanê derbirînê hemî alavên spehî û bedew bi dest xîne da ko hebûnê bibêje, man û nemanê biguhêzîne, herdemî û berdewamiyê ragihîne, û di wê sewiyetê de jî bikaribe dîrok û çand û hişmendî û şaristaniya gelê xwe biçesipîne, biparêze, dolmêndtir bike, û çend angoyên pîroz û balkêş û bi rûmet pêşkêşî herikîna hebûna wî bike. Neko wêje ji derveyî wêjeyê û li derveyî alavên wêjeyê bête nivîsandin. Neko nivîskarê wêjeyê zimanê xwe ji sewiyeta zimanê kolanê wergire yan jî ji zimanê yê berî xwe, û ji nû ve, ji bêçarî, careke dîtir, bi derbirîneke kambaxtir û bi behreyeke zuhatir û bi alavine bawî, li me vegerîne. Neko zimanê nivîskarê wêjeya kurdî bê ziman be, mebesta me bê zimanekî xweser û taybet û bê tevî û ristîneke cihêwaz be. Ma îro ji bilî zimanekî ku hemî nivîskarên kurmanckî di navbera xwe de ew dabeş kirine, heye?

G ERYANEK LI MEM

Tengezarê Marîni



Sala 1995 an
ya ko bi sala
Ehmedê
Xanî û Mem
û Zîn hate bi
navkirin,
gelek nerîn û
dîtînên
cihêreng û

hemreng diyar kirin, û di gorepana
lêkolînê de, gotarine giranbûha û
bejinbilind hatin pêşkêşkirin û
derbirîn. Lê ji derveyî wan
çalakiyan, em dixwazin li ser peyva
Mem rawestin.

Liserrawestan dê ne tenê ji bo
naskirina wateya wê ya ferhengî bit,
lêbelê dê di Mem û Zîna seydayê
Xanî û di destana kurdî ya herî bi
nav û deng Memê Alan de,
ronîkirina amaje, nîşan û rola hunerî
be.

Di pêşgotina xwe de, ya ko ji bo
destana Memê Alan nivîsandiye,
Nuredînê Zaza dibêje ko ' Mem ji
Mihemed hatiye ango kurtkirina
navê Mihemed e' .

Di baweriya me de, ev ji wê tê, ko
kurd piraniya caran navan kurt
dikin, mîna ko em dizanin ji
Silêman re dibêjin Silo.

Eger em werin û li nav rûpelên
mîtolojya mezopotamyê bigerin,
emê peyva Memo di gelek deqên
(tekst, heyber) Sûmeran de bibînin,
wek nimûne, di lehiya mezin de, ya
ko bi navê ' Jnoma Jîlîş' tê bi
navkirin, peyva Memo wek navê
xwedayekî derbas dibe. Di ' Jnoma
Jîlîş' de berî afirandina erd û ezmên
sê xwedan hebûn:

- 1- Apso: Xwedayê ava şêrîn bû.
- 2- Tiyamat: Jina Apso û Xwedaya
ava şor bû.
- 3-Memo: Xwedayê mijê bû, û
hindek dibêjin ko ew ji levketina
pêlên ava yekemîn bû, û nerîneke
din jî di heman mijarê de dibêje ko
Memo mija ko li ser ava yekemîn
hatiye vedan û jê hatiye afirandin, e.
Bi kurtî, di mîtolojya

Mezopotamiyayê de, bi vî awayî
navê Mem derbas dibe, lê niha em
dixwazin li ser navê Memê ' Mem û
Zîn' û yê ' Memê Alan' û di pey
re, li ser çend peyvên Kurdî, ko
Kurd di jiyan xwe de bikar tînin û di
fonetîka xwe de nêzîkî peyva Mem
in, rawestin.

Dema ko Mem ji dayik dibe, hem di
destanê de û hem di Mem û Zîna
Xanî de, diyardeyên pîrozî
(avrateyana) berz û bale dibin.

' Rebê Alemê kurikek daye û sê
çirûskên nûrê di rû de berdan' .

Dema ko pêxember Mihemmed ji
dayik bû, wek nîşana vê nûzayînê,
cîhan ronî bû. Û dema ko peyam
(wehî) ji hizretî Yûsif re tê û ji bavê
xwe re dibêje: Yabo min dît, ko roj
û heyv û yazdeh exter ji min re çûne
sucûdê.

Li vê derê bi daneberheveke piçûk, diyar dibe, ko Mem, regekî ji rengên avratiyê distîne.

Dema ko Beko -şîretkarê Mîr- berê mîr, Celaliyan û Mem jî bi wan re, dide şer, bi sebareta ko ji Mem xilas be. Mem derbekê li xwe dixe û vedigere mal û berê xwe dide koçka mîr û diçe oda Zînê. Beko mîr û êlê vedigerîne û Zîn û Memê dibînin... Hesen, mêrê Sitî xwîşka Zîn û mîr, xan û manê xwe davêje êgir û hawarî mîr dike, Beko nahêle mîr bi wan ve here. Hesen radibe kurê xwe Celal davêje nav êgir Sitî dîsa hawar dike, Beko dîse lîstika xwe dilîze, lê vê carê mîr, şemaqê li Beko dixe, devê Beko dikeve nav azê û diçe, Mem derdikeve û ber bi hawarê ve diçe, hawar dike ocaxa xalan û derbasî nav êgir dibe û Celal sip û sax ji nav êgir derdixe. Li vê derê Çîroka Nemrûd û Ibrahîm Xelîl, ya di quranê de hatî, tîne bîra me dema ayet dadikeve û dibêje:

"Agiro, li Ibrahîm bibe hînkayî û hêminî"

Ma di vê derê de, Mem rola xudê nalîze...? Dîsa di destanê de, dema Mem û mîr bi şitrencê dilîzin û bi fen û fûtên Beko Mem lîstikê winda dike. Mem dibin bircê, bi zincîran, lingên Memo girêdidin, ew zincîr sor dibin, dibin mar û ziha, bi pey Beko dikevin. Ev çîroka Mûsa pêxember û Ferûn tîne bîra me. Mem wek siwarekî mindal, bêguneh, ji bo evîna xewna xwe Zînê, li bajarê Cizîrê, di Zindanê de dimire, lê dibe sedema vemirandina şer -kuştina Bekoyê ewan. Ev jî di mîtolojya Zerdestiyan de, cengeke

gewre di navbera xwedayê xêrê û roniyê Ahora-mazda û xwedayê şer û tariyê de Ahrîman de çê dibe û Ahora-mazda Ahrîman dikuje û ew bi tenê xweda dimîne. Ez van herçar hînkêrên ko me li jor nivîsîn û daneberheva wan, ji xwêneran re dihêlim. Çimkî heyber bi wan tê vejîn. Li aliyê din, emê bêne ser çend peyvokên, ko di form û fonetîka xwe de, wek; yan jî nêzîkî Mem dibin.

-Dayika kurd, çaxê hest dike, ko zarokê wê tî ye, avê didiyê û wişeya mem bikar tîne.

-Memik: ev bêje, ji sînga keçên nûgehayî re tê gotin. Ew jî ji mem hatiye weke çawa em dibijin: Jin= jinik. Kin= kinik. Mêr= mêrik...

-Mam: ew ji birayê bav re tê gotin, yan jî dibêjin ap (apo, mamo, amo). Peyva Mamo ji mirovekî, şareza û temendar û xwedî serbûr û serpêhatî re tê gotin. Mem jî, hem di Mem û Zîna Xanî de, hem jî di Memê Alan de, zîrek e, û dibe xwedî serpêhatîne mezin.

-Mûm. Mûm wek material tê bişaftin, û encama bişaftinê ronî belav dibe. Mem jî jîna xwe dike qurban, û di encamê de şer -Beko-vedimre.

Mebesta me ji vê yekê ew e ko pir tiştên me winda ne, û carcaran derdikevin, lê dibin milk û mîratên mîletên din, û bi zanebûn, yan jî bi nezanebûn, em ji wan werdigirin û dibêjin ev ya filan û bêhvan mîletî ye. Û em weke mîlet, civat û gel, ji ber pir sedeman, ko ev gotar ne cihê axaftina wan e, pir tiştên me li ber lingan çûne, yan jî, ji bo gelên din

bûne tiştine bi nerx. Ev kultûra me
ya devkî û zengîn pêwîstî nivîsîn û
lêkolîna ye û tişteki gelekî diyar e,
ko di guhestinê de pir regez û rol
winda dibin, û çendine nû şûna wan
digirin, lê hin tişt wek xwe dimînin.
V.prop di Struktûra Çîroka Gelêrî
de dibêje: Nav û dimenên lehengan
têne guhertin, lê erkên wan, wek
xwe dimînin.

Jêder

- 1- Memê Alan. Pêşgotina Dr N. Zaza. R11, Şam. Çapxaneyê Kerem
- 2- Memê Alan R3. Bahoz. Sal 1973. Uppsala. Swêd
- 3- Bunyet elnes elserdî. Dr Hemîd Elhemdanî, 1992. R68
4. Mûxameret eleqil elûla. Fîras Elsewah. R42

GAZIN

F. Çolî

Dîlberê!

Ger tu bivêt birînên
min ên netebitî vejînînî
û xemên min ên radayî
har bikî
Tu min nehejînî

ey dîlbera min!

Tiyekî şehitî bûm
di kerkela germê de,
Li ber dergê ingiriya dilê te
dîqçiqçîn hestên min ên daxdayî
dîlber!.


Di zivistaneke kurdûnde de
Bi bazirganiyên ewran re
baskê xwe
li bayê
oxireke
bêveger dixê

ey dîlber!

De bese ey...!!!
Te hemî şahîşînên kenok
di şaristaniyên lêvan de
wêran û kavil kirin
û te hemî herifandin
ey dîlber



J I DÎMENÊN CENGA MEZIN



Heyranok

daneheva Sebrî Botanî

Kuriko dîno

**Kuriko dîno were were hêdî hêdî çem û çem e
Bila Xwedê xira bikê mala sultanê romê
bi ser de şahê ecem e
Were destê min keçikê bigre birevîne bibe Wanê
Soz û qerar min gotiye lo lo gidî
sax û mirî ez ya te me
Keçikê dînê dibên Ava Muradê lem û lem e
Xweşî û delaliya deşt û çiyayên Wanê
ji dilê min û te re sal û dem e
Sûndxwarî me cana minê tirsê romê
ji xwe re nekim bar û xem e
Û ez ê destê te nazikê bigrim birevînim
bibime Wanê, behîştê bavê me Adem e.**

Sebrî Botanî

Sal sala 1947ê ye, bajar; bajarê Mûsilê ye, tax; taxa Şehbaz e, mal; mala Selîmê silo ye.. Ew çend şevêk bûn ji êvara xwedê ta derengî şevê, Silêmanê Misto, Mecîdê Serhedî, Casimê Mişextî, Keleşê Bazo, Şahîne Xito, Evdîrehmanê Zerê, pîra bênav-pîra Bedlîsî- Dirbasê Wanê û jina xwe Zelîxa Talo, li vê malê dicivîyan û dabaşa kesên malbatên xwe, yên ko bê ser û şûn winda bûbûn, dikirin. Û hem jî serpêhat û bihîstinên xwe, û yên nasên xwe jî, bi xem û axîn û hahî felekê hahî, ji mela Sedîqê Şîrnexî û mela Şemseddîn re bas dikirin. Dako bi alîkariya Yonis Cewdet hakimê belediya Mûsilê ko ew bi xwe jî xelkê Wanê ye û destê wî digihêje Îranê jî, belkî li windabûyan bipirse. Herkesê carekê bihata vê civatê êdî çar ji xwe nedikir, her car dihatê... Bi hezaran ên mîna van çarereşan di navbera salên 1914-1930 an de ji bakur, nemaze ji deverên Wan û Serhedê bazdabûn û berbi başûr ve mişext bûbûn. Nîvek ji wan bi zigurdî û rahodeyî xwe gihandibûn deverên Zaxo, Amêdî, Dohok û Mûsilê. Hejmarek nekêm ji wan pişikdarî di cenga yekema cihanî de kiribûn- seferberlik- çend kesek di nêv wan de hebûn nemaze Kerîmê Xelîl û Silêmanê Misto bi hêsanî û şarezayî guhdarên xwe li çiya û dol û geliyan digêrandin. Geh dikenandin, geh digiryandin. Hiş û hewes ji wan distandin, bi dabaşan ve dişidandin. Dabaşên tirs û lîrêzê, nalenala birîndarên bê nan û derman, pîrbûna rîjk û spihan. Zêdebar dabaşa zor û zulm û bê rehmi û bêbextiya dewleta romê, nemaze beramber gelê ermenî, cerg û hinav li guhdaran diperitandin.. Silêmanê Misto bi rengekî rind û xweşik dipeyivî, loma xelkê civatê wek ko di nêv bûyeran de bin..

Silêmanê Misto digot: Ne wijdan, ne fihetî û ne ji dîn û exlaq, wê demê li nik dewleta romê nemabûn, lê ma kengî û di kî demê de ev xesletên baş li nik wê hebûne?

Piştî hingê bi alîkariya mela Sedîqê Şîrnaxî û mela Mihemedê Goyî min çend şervanek dîtir nas kirin. Êdî ji hingê ve geh li vê malê, geh li wê çayxanê, ha li vî gundî û ha li wî çiyayî, ta sala 1991ê şiyam (6) defterên sêsed rûpelî ji van bîranînan dagirim, lê pir mixabin (4) ji wan li mala kurê min Kisra, piştî serhildana pîroz ligel navmala wî, ji aliyê me kurdan ve bi talan çûn, êdî bi pîrs û pîrsyarên dost û hevalan jî saluxek jê nehat hildan. Her çawan be nuha defterek û nîv ji wan bîranînan maye û va ye em ji tîpên erebî dikin latînî û pêşkêş dikin.

Carsed nefer esker em şêst û heşt ji kuştinê verestibûn. Ew sê roj bûn xwarin jî bi devê kesî ji me neketibû. Zik û piştên me bi hev ve mabûn. Zabitê me Hikmet Efendî hat û got:

Ez baş dizanim ev saxiya me ji bextreşiya me ye. Em ji bextreşiya xwe bi hevalên xwe re nehatine kuştin. Lê pa em hez bikin an hez nekin va ye, em sax in. Dijmin me bikujin, bila. Mirin jî, bila. Ev ne şerm e, lê ya şerm û fihêt û ne durust jî, ew e ko em xwe bi destên xwe bikujin...Lawino! xwe nespêrin vê mirina pîs û kirêt. Eve ez yek, çendek ji we jî navê Xwedê bînin, rabin em herin xwe berdin van dol û newalên dirêj û hilkişin navsera vî çiyayê bilind û mezin. Xwedê ye,

bavê rehmê ye, belkî em ji xwe re berazekî, pezkoviyekî, hovekî, hema Xwedê çi kire qîsmet nêçîr bikin.

Hikmet efendî gelek şîretên wek van ducar û şeşcar kir, lê ji çar neferan pêvetir dest bilind nekirin... Nêçîrvanên me çûn, lê me bawer nedikir ko em û ew êdî careke din hev bibînin... Reperepa dilê me ye. Em Ayeta Kursî dixwînin û pîf dikin xwe û çiyayê bilind, ko hema nêçîrvanên me bi saxî li me vegehin û nêçîreke berketî jî bi xwe re anîbin... Baş bû, hêştî rojên me û wan ji dinyayê hew nebûbûn. Bejnecroj mabû, me dît va ye hatin û kelaxekî jî li pey xwe radikêşin... hirçek mê bû, mîna gayekî bû. Ew neferên jar û sar li termê hirça xwe werhatin, wek biçûkan xwe li dorê hilavêtin û hezar aferî û yahê yahê li nêçîrvanên xwe barandin. Hikmet Efendî dizanî ko nîvek ji neferan goştê hirçê naxun. Heger bixun jî dê pê tadar bikevin. Loma wî gazî melayê blokê kir û got:

- Xoce, xoce, ez xulamî xoce. Lezke were goştê vê hirça Xwedê li me helal ke.

Xoceyê nîvmîrov bi kotekî xwe kenand û got:

- Ez dê çawan helal kim?... Ma berx e ez helal kim, efendî?

Hikmet efendî tîqetîq ji xwe anî û got:

- Ma ko berx bûya, fetwa te ji bo çi bû seyda?. Pa tu çi tov mela yî?. Me hizir fikir tu melayekî jîr û şareza yî. Mela ew mela ye, ê ko di tengasiyeke wek ya nuha em tê de ne, rêyekê dibîne û navê Xwedê li ser tîne. Ma ne weha ye eskerno? De ka hûn jî tiştêkî bibêjin, şerîeta min û melayê xwe bikin.

Hindekan digotin mirina me xweştir e bi me ji xwarina goştê vê hirça pîs.

Hindekan jî digotin, bi Xwedê ta xoce efendî fetwayê li ser nede em naxun. Ên dîtir hemû ji xwarinê re li pilê bûn... Xoce efendî ko dît serêşî jê çêdibe, hem agir berdabû dilê wî ko neferên bê xurak û birçî didît. Hem jî wî dizanî, ko neferê birçîtir û bê çaretir jî, ew bi xwe ye. Wî êdî deng û taqeta bangdanê jî nemabû. Ew naçar bûbû neferekî hînî bangdanê bike, loma êdî xwe negirt û dev bi xwendina fetwayê kir. Piştî xwendina fetwayê beşîşî û got:

- Lawino hay jê hebin, nehêlin yek dilop ji xwîna wê birije erdê. Berî hertiştî piyanekê jê dagirin bînin, da ez berdim ser pişên xwe û kezeba wê jî bînin, da ez bi xavî û neşiştî bixum. Paşê goştê wê yê ter û nazik di qaqbekê de bikelînin, da xweşmêrên me hinavên xwe yên sar û hişk pê germ û nerm bikin. Çi xwarina hebe dûr ji gumanê rahêlinê û bisteh bixun, da li we bigivire. Goştê vê hirçê jî wek goştê berxekî. Wek şîrê dayikên we, li we durust û helal e.

Ev melayê me çi gava tenê dima, hingê ji xwe re qesîdeyên meleyê Cizerî bi melûfî dixwendin û car bi car jî xwe bi nivîsandinê mijûl dikir. Lê wî vê carê li ber serê hirçê kaxezek biçûk ji paxila xwe derxist û xwend, em hemî pê guhişandin û têr kenandin jî. Çunkî tikesî ew hizir jê nedikir. Nemaze wî bi ayeta hirçê û bi fetwa kurmancî bi navkir û got:

**Bixun goştê vê hirçê
Çerm û hestî û pirçê
Nûşîcanê me ye ew**

Jê bînin mirçe mirçê

Evdokê cizîrî yê ko bi Çepokê sermezin navdar bûbû ji ciyê xwe bi germî lîland, tilîlîlî û paşê got:

- **Hey, tu çavê serê min î, mela. Ser bextê min tu diwazdeh ilm î. mela.**

Tu miftiyê zeman î, melayê Alî Osman î, pir bi dev û ziman î, tu hertiştî dizanî, şarezayê qur'an î, fetwa ji bo me anî, tu hevalê jaran î, li me neke bargiranî.

Çend neferek zîrek û zikvala bi xencer û qameyên tûj hirça xwe kevilandin. Ew goştê ter û qelew, ji êk deranîn û parçe parçe kirin. Çav jê têr nedibû. Hikmet efendî bi quretî hate pêş û got:

- **De hûn bizanin em çi şêr in û çi nêçîrvan in jî îro. Ma ne wilo ye?. Tu çawan dibînî, melayê min?**

Melayê nîvmirî dîsan bi kotekî xwe kenand û got:

- **Hûn dibînin vê hirça ji min bextreştir çawan ev Hikmet efendî li ser serê me kir Eskender?. Tu dibêji qey textê qeyserî standiye.**

Hikmet efendiyê bejin bilind û çil salî, ji qehra dilê xwe bi hêrs got:

- **Heger berî vê cengê bûya, erê. Lê li ser bextê min be, ev nêçîra me ji textê Qeyser û yê Sultan jî çêtir e.**

Çepo xwe nêzîk kir û bû niçenîça devê wî û bi awakî nîv cizîrkî got:

- **Axxx, ax, xwezî hewe nekuşt. Heke hewe bi saxî bianiya minê li xwe mehir bikira. Ew dest bişkê yê ko ev xanima çiyayî kuştî.**

Ew neferên birçî wek ko qet birçî nebûbin, an jî birçîbûna xwe ji bîr kiribin, bangî hev dikirin:

- **Heydê bixun her bixun, goştê jina Çepo bixun!**

Xoce Efendî bi xemgînî li goştî temaşe dikir, serê xwe hejand û got:

- **Heger ev rewşa me weha dom bike em dê goştê laşê xwe jî bixun.**

Me goştê hirça xwe li xwe radigirt û piç piç dixwar... Piştî hingê bi sê rojan û bi fermaneke eskerî, me ew ciyê xwe berda û em çûn ciyekî dûrtir û me di korteke pan û dirêj de xwe çepirand, li hêviya blokek esker, da em û ew bi hev re herin bigehin firqeya xwe, ya ko xwe ji bo êrîşekê berhev dikir... Ko Çepo ev zanî, herdu destên xwe raberî asmanan kir û got:

- **Xwedayooo, ez goryayooo, rev ji me nayê ew berê me didin êrîşê.**

Hikmet efendî vê carê ji hemî dilê xwe enirî û got:

- **Kuro Çepokê çepel bes bi van gotinên xwe yên pûç dilê eskeran ji eskeriyê sar bike! Min neçar neke ez te li van gotinên vala poşman bikim.**

Çepo mîna şerekî û bi dengêkî bilind gote zabitê xwe:

- **Ezbenî ma ez neheq im?... De hêsko me nîvtêr bikin paşê daxwaza êrîşê ji me bikin. Me nan nîne, ew fişek û berikên topan ji me re rêdikin. Şikir ji Xwedê re te bixwe jî dît pê çar nefer ji me di wî çeperê hinda devê gelî de ji birça mirin.** Hikmet efendî pir ji Çepo hez dikir, çunkî esker bi tevz û tinazên wî kêfxweş dibûn.

Lê mixabin tu çend bibêjî, ew dilovanê dewleta Alî Osman bû. Ew çeper bi çeper û çadir bi çadir diçû, neferê xemgîn û birçî şîret dikir. Wî ko zanî dema êrîşê nêzîk bûye, neferên çeper û çadîran hemû li xwe civandin û got:

- **Em bê nan derman in, rast e... Em dilşkestî ne rast e... Vê cenga mirovhêr tirsî mirinê aniye ber çavên me dîsan rast e. Lê bawer bikin, ko dijmînê me jî mîna me ye û pir ji me tirsîyaye jî çunkî me ew çavtirsandî kiriye. Êdî xwe tengav nekin, ha ha nêzîk e Xwedê ji me re li hev anî. Sê çar pênc rojên din nan û girarên germ û xweş li hêviya me ne. Hingê her bixun, vexun û ji Xwedayê xwe bixwazin, ko serdera Sultanê me bilindtir bike. Bizanin jî ko di nêvbeyna kesê wêr û newêr de tenê mûyek heye.**

Çepo dîsan zimanê xwe dirêj kir:

- **Ew bihiştî ko Hikmet Efendî jê dibêjit, xêra Xudê ye û ji qîz û bûkên rûsan dagirtiye, herinê û li xwe nekin derengî. Lê tirsî min ew tirs e ko her kezî zerekê simbêl sorek hebit. Xwedayooo tu heqê me wînda nekî. Tu ji wî bistînî, yê ez dizanin.**

Ev gotina Çepo li xoce Efendî xweş hat û wî jî got:

- **Amîn Xwedayo amîn, tu vê daxwaziya Çepokê nîvminafîq bi cî bînî.**

Hemû kenîyan û amîn amîn gotin... Digel ko Hikmet Efendî di hizra xwe de ji neferan cuda û neqayil bû jî, lê wî di wextê wisa de xwe radigirt û weris ji rexê xwe ve sist dikir, wî jî wek wan digot û dikir jî, da esker xwe jê nedin paş, da bi gotinên wî bikin. Loma wî vê carê bersiva Çepo neda, lê wî bi ser gotina xoce ve zêde kir:

- **Ez di bextê te de me xoce, tu ji buhayê Çepo kêr nekî, Çepo yek û nîv e, ne nîv e mîna ko te kerem kir.**

Çend rojek din jî borîn hêştî pergala me wek xwe ye û dixuya ko dê her wek xwe bimîne jî, heger kambaxtir nebe. Nîşana vê pergala me di wan gundên nîvwêran û nîvberdayî re diyar dibû. Çi gundê em diçûnê vala bûbûn, heger kitkitên malan, hindek jin û zarok yan kesin pîr û ji karketî tê de hebûna jî, lê ew jî di rewşa me de bûn, wilo jî em neçar dibûn tiştine xwarinê ji wan bistînin... Rojekê ji sê gundên mezin me pazdeh nanên kilor anîn, her şeş neferan ji me nanek û nîv berket...

Çepo ji korfelaqî hudhudek bi rê ve girtibû, pir pê kêfxweş bûbû, bi hudhud re mijûl dibû û jê re distirand:

Teyriko balafiro

Ez bi xudêkim te bernadim.

Kesî nekiriye û ejî nakim.

Ez vî zikê birçî birçîtir nakim.

Hudhudo hêlîn wêrano xelk û şênî dibêjin tu qasidê Belqîs û Silêman î.

Bextreşo ez çî bikim ko vê êvarê tu ji canê Evdokê cizîrî re xweş derman î.

Ezê bi navê Sultanê xwe te bixum, da bikim şerê misqofan bi zikê têr qehremanî.

Çavê Hikmet Efendî vêket û qêrek dayê:

- Kurro Çepo ew çî ye? Zû berde ma tu ji Xwedê natirsî, ko te ew teyrikê belengaz girtiye? Ma te nezaniye ew posteçiyê Silêman peyxember û Belqîsê ye?

Bersivên Çepo hertim hazir û entîke bûn:

- Pa bi Xudê kim, ew kurê Silêman peyxember bi xwe jî bit, ezê wî li binê zikê xwe dim. Ma ez çî bikim efendim? Ew şûna nan û girar e, dermanê zikê sar û jar e.

Sê rojên din jî borîn ji sê salan dirêjtir bûn, bloka eskerê me hêsta nehatiye û hatina wê hatobat e. Lê heger hat jî, kî nabêje ko neferên wê, ne ji me birçîtir û rebentir in?...

Derdê me rindî û mirovatiya Hikmet Efendî bû, wî ji hemî dilê xwe ji esker hez dikir, loma neferan jî şîret û gotinên wî nedişkandin û serên xwe li ber wê rewşa reş diçemandin...

Gelek rojan neferên me bê tayin diman. Roja xêr û bereketê şorbayek ron hebû, ew jî 'Av ji rû, bereket ji Xwedê' bû. Me kevçik li binê legena mezin digerand tiştek nediketiyê. Rengê xwe jî, ji rengê her giyayekî hişkê ji çolê dikirinê, distand. Wîlo jî neferên jar û şepirze kêf û sema jê re dikirin. Van xwarinên ko bil ji me tikesî nedîtî, gelek beste û stiranên kenokî û xemokî ji Çepo çêdikirin.

Hey wernê wernê

Eskero wernê wernê

Hey wernê wernê wernê

Gedeno zû bigehnê

Jehra serê maran e

Xudê bikê derman e

Lawno wernê talan e

Gedeno zû bigehnê

Vereşana kitikan e

**Xêra serê Sultan e
Kesê nexut poşman e
Gedeno zû bigehnê
Hey wernê wernê wernê
Sêwîno wernê wernê
Hey wernê wernê wernê
Birçîno zû bigehnê**

Wisa, me ew rojên hişk û dijwar bi kêf û dîlanan diborandin. Me xwe dixapand û şerê mirinê pê dikir... Em li hêviya hatina bloka esker bûn, lê ew jî nehat û her nehat. Hindek dibêjin nehatina wê çêtir e û hindek jî dibêjin hatina wê çêtir e, belkî kedek, zadek bi wan re hebe. Çepo çare ji zimanê xwe nekir, dîsan wek hercar dirêj kir:

- Bila bèn, bila bèn da ew jî vê sentenetê ji xwe re bibînin û ji vî şekirî bixun. Bawer bikin, ka çawan em li vê dê tama devên xwe bi hatina wan xweş dikin. Niho ew jî li wê dê welê tama devên xwe bi me xweş dikin. 'Mişo were cem bavê xwe'. Bila werin, da ko em û ew devên hev bialîsin.

Hilma girarek wek a mirovan li me bûbû xwîna Siyahoş. Ta êvarekê ji nişkê ve qelawîzê serê milê gazî kir:

- Ew çi reş e ji dûr ve diyar e û ber bi we ve têt û dilezîne?
Gotina wî rast e, reşek dixuye lê em dê çawan bi van çavên ko ji bê xwarinê tarî bûbûn bizanin çi ye?. Çawîşokê me bi dûrbînê temaşe kir û got:

- Mizgîniyê bidin hevalên xwe. Zilamek e û li dewarekî swar e, an ker e an hêstir e. Lê heger ker jî be wek hêstirekî ye.
Hindekan digot du-sê olçe genimê hêrayî ji me re aniyê û hindekan jî digot belkî posteçiyê blokê be. Çepokê her dem hazir, wî jî got:

- Madem ew bê bac ji nêv lepên me dernakevit, hema kî bit bila ew bit.

Swarê kerê gewr hat û ji kerê xwe daket û silav da:

- Selamo eleykum gelî birayên esker.

Çepo serê kerê wî girt û got:

- Wey tu bi kerê xwe ve li ser serê min û yê heft bavê min hatî, swaro. Em li esmanan li te digeriyan, tu li vê çolistana dinyayê kerem dikî ber destê me. Heke xudê didit, nabêjit tu kurê kîş dêhlê yî.

Kerê wî jê standin û... Here, tu bixêr biçî. Here û li xwe neke şev û derengî, heke te divêt kurtanê kerê xwe nehêle, bi xwe re bibe. Zilamê reben û rêvingî dev bi lavan kir:

- Eman, ji bo Xwedê ez mirovekî jar û perîşan im, li ser darê dinyayê ji vî nêrekerî pêvetir, min tuxmê dewaran nîne û birayê min jî mîna we esker e û ev sala duyana em jê bê xeber in jî....

Neherê, ev lavelava wî tiştek pêve nehat. Qeşitandinê û ji cem xwe dûr kirin. Dilê wî li nik kerê wî bû. Geh diçû, geh disekinî û paş xwe ve dinerî, lê kesî negotê were kerê xwe bibe. Her tenê dilê xoce pê şewitî û bi dengê lertzokî got:

- Ji bo Xwedê kerê wî bidinê û şûna kerê wî de min bixun.

Hikmet Efendî xwe enirand û got:

- Tu Xwedê seyda mayê xwe têneke. Bila dilê te bi me jî bişewite, ew yek e, em sed in. Me jî wek te dil pêve ye, lê em çî bikin erdê me hişk e û dewleta me hişktir e.

Xoceyê me pilmê xwe kir û ber bi çadîroka xwe çû. Çepo gazî xwediyê kerî kir û got:

- Te melayê me jî enirand, tu diçî here, tu neçî ezê te jî bikim qawirme, îca here û li xwe neke derengî. Bi şîreta xêrxwazê xwe Evdokê cizirî bike çêtir e.

Mêrik reva Xwedê revî...Neferên çeleng û birçî kerê gewr li erdê dan û serjêkirin û zû zû parçe parçe kirin, kirin sêzdeh pişk, her pişkek jî heft kesan re. Serê wî jî ji çar kesan re û kîr û herdû gun û parçek lexe jî ji me çar kesan re. Lê me qîma xwe pê neanî, me gazina xwe bir ber destê Hikmet Efendî:

- Efendim, me gotiyê, ma Xwedê qebûl dike ka ew serê mezin û qelew ji çar kesan re be û kîr û gun û pişika çermelaq ji bo me çar kesan be?...Baş e, lê bi wijdana te, ev wijdan e?...Ha bibîne, hema zimanê wî tenê ji vî kîrê me çêtir e, de gene du-sê bost rûvîk jî bidin me.

Hikmet Efendî xwe li me tîrş û gemû kir û got:

- Wijdan?...Wijdana çî oxlim, heger wijdan li dinyayê hebûya an mabûya ev ceng nedibû û ev bi serê me nedihat û me jî ev kotek û zorî nedikir. Ma kengê ev wijdan e, em kerê wî belengazî bi darê zorê jê bistênin û bikine d...?

Neferekî me hebû, navê wî mam Xidirê Qefqasî bû. Vî mam Xidirî gotina Hikmet Efendî birî û got:

- Ey Xwedayo, xelk û şênî li bajaran nanê genim, goştê berxan, baqîsmat û kutilkan dixun. Lê em li vê çola dûr li ser piçek goştê ker û hirçan ser û dilê xwe diêşînin. Ma gelo mirin ji vî halî nexweştir e?

Çepo zanî dilê Hikmet Efendî bi vê gotina mam Xidirê eşiya û bersiv ji cem xwe da:

- Hey bavê min, mam Xidirê şareza. Ew kesên xwarinên xweş dikerifin, ew ne kesên wek min û te ne. Kesên wek me li her cihî, piştî hewkirina goştê kûçik û kitikan, îro goştê mişk û maran jî li wan hisret e. Bêje hindek, nebêje şênî, şênî şênî ye û hindek çend çepel û bazirganek in.

Vê gotina Çepo kêfa Hikmet Efendî xweş kir, delîva axavtinê jê re hat û li esker heyland, got:

- Vî dergehî daêxin û êdî nevekin, bizanin baş bizanin ko gotina rast 'Yasaq e'.

Piştî vê gotina xwe Hikmet Efendî her hat û çû û bi wan re şewirî hilanîn û danîn dûvik jî avêtin ber me. Çepo di wê gavê de dîsan besteyeke tal û şêrîn di serê xwe yê mezin de hûnand û ji devê xwe girelkir govend pê geş kir:

Werin xêra vî serî

Bixun goştê vî kerî

Zû werin, kes nemîne

Çi yoldaş çi hemşerî

Hêştî nîvpîj nebûbû me rahêlayê. Bixun her bixun. Me bêhna xwe pê derkir.

Bawer bikin ta hingê me xwarineke xweş wek wê nexwaribû.

Ta nuha jî gava tête bîra min xweşiya wê dikeve devê min. Çepo besteyek xweş û pîs wek a berî nuha, bi awayê 'lêlê kin e' çêkir û em rakirin govendê:

Bixun bixun lê lê lê

Xweş kebab e way way

Kesê nexut lê lê lê

Ew sebab e way way

Hingê ji nû min zanî ko em Kurd ji hemû xelkê vê dinyayê kêftir û xweragirttir in jî, çunkî ên dîlan dikirin hemû Kurd bûn. Me çawîşekî hevêrkî hebû hat û got:

-Rast e ko dibêjin qona tazî tenbûrê dixwazî. A rast dilê min jî diçûyê ez bi we re xwe hilavêjim, lê Xwedê mala xwediyê vê cenga çepel wêran bikê, wê ez kînoj kirime. Dibêjin kesê kînoj zû bi zû narî, da zû birçî nebê. Lazim e em jî wilo bin heta ev şer heye.

Hikmet Efendî, ne ji dil, kêfa xwe diyarkir û got:

- rast e, êş û jan li her cihî heye û em bê doktor û bê derman in jî, lê pa maşala wilo jî eskerên me hemû az in tu dibêji qey her sê danên rojê goşt û birincê Qerecdaxê dixun.

Çepo dîsan xwe negirt:

- Efendim, hey ezbenî, ev gotinên vala me têr nakin û dilê me jî xweş nakin. Ma te nebihîst çawîşê me çi got. Ya qenc ew e em herin melayê xwe haş bikin. An te ji bîr kiriye?

Hikmet Efendî nedizani çî bike û çawan vê rewşê ragire, wî xwe ji bîr kiribû wê gavê. Hema got:

- **Li ser bextê kerê min, tu ji me çêtir î, Çepo.**

Çûn...lê çî bibînin?...Va ye melayê reben çûye ber rehma Xwedê û bistika ji goştê kerê gewr wek xwe dest û dev lê nedayî maye. Hikmet Efendî eniya wî maçî kir û got:

- **Te gelek Yasîn û ayet li ser mirî û kuştîyan xwendin. Lê ko tu bi xwe mirî kesek nebû ayetekê bi teve bixwîne... Te her digot xwezî careke din ez bi saxî li zarûzîçên xwe vegebaranî û min bi dilxweşî xweyîti li zevîka xwe û rezkê xwe kirî wek berê. Lê pa va ye tu mir î û te nedît.**


Saluxa mirina xoce Efendî bi dengê Çepo li wê şkefta devê gelî deng veda:

- **Heyhêêêê... Mela jî serê Sultanê me xweş. Fatîhê bixwînin.**

Bil ji wî neferê raserî devê gelî kesek nema, her yekî ji cîyê xwe ber bi çadira Xoce Efendî ve çûn... Hindekan fatîhe xwendin û çendek jî li sîxka goştê kerî werhatin. Neferekî çilek rahişte sîxka goştî û revand. Hevalên wî li pey lezandin û Çepo qêrek da û kir hawar:

- **Lawno bigehîne, jê bistînin û dest nekinê. Ezê ji rehmetî re bikim xêr.**

Lêkolînek li ser govend û dîlana Şêxanî ya pîroz



Stirana şêxanî
Peyv bajarê şêxan
Mork (stîl): dîlan.
Hewa: Beyat
Pîvana Xanê 2/4 yan 4/4

Beşîr Botanî



- 1- Delîl im, Delîl im, Delîl im lo
- 2- Delîl im Delîl im, şêxanî
- 3- Delîl im, Delîl im, şêxanî

Baedrê gundê mîran
çarsed malêt pismîran
 çarsed malê pismîran
Baedrê di korê da
Qesra mîran wa têda
 Qesra mîran wa têda
Baedrê ser seqlqan e
Nextê zeryan herzan e
 Nextê zeryan herzan e
Mala te l' mezrê danî
Yêk zanî, yêk nezanî
 Yêk zanî, yêk nezanî
Hey ronahiya çavan î
serbextê min tu c'wan î
 ser bextê min tu c'wan î
Destê yêk û du bigrîn
Pêkve dîlanê bikîn
 Pêkve dîlanê bikîn



Êzîdî û şêxanî

Pîrên êzîdî bi çavekî pîroz li vê govend û dîlana reşbelek temaşa dikin û heger ew di cejin, dawet û tewafan de beşdariya ahengê nekin, divêt hevbeşiya şêxanî bikin. Berî ko

aheng bi tekûzî hew bibe, hingê bi vê şêxaniya pîroz tête hewkirin; micêwirê gundî, çend rihsipî û pîrejin li pêşiyê dest bi vê govend û dîlanê dikin, bi heyîna xwe dijmêrin û dibêjin:

Bila xort xwe ladin û rêkê bidine me, ev govend û dîlana me ye!

Bêguman, ev şêxaniya pîroz, gav û hizrên lawîniyê tîne bîra wan pîrejin û pîremêran; kurdîtî, êzdîtî, gundîtî

û di ser hindê re, evîna rast, durîst û pakij!

Dema ko ev govend germ û coş dibe, pîrejin jê derdikevin û rêkê didine pîremêrên ko dixwazin berdewam bibin, deholvan û zurnevan jî xwe hêdî hêdî ji govendê dikêşin. Êdî dîlan dest pê dike; keç, jin û pîrejin bi tilîlî (lîlandin) û dengê xwe dîlanê geş dikin, pîremêr bi tepe tepên piyên xwe, xort jî bi fîke, çepik û dengê xwe şahiyê xoş dikin. Lê dîsan kur, mêr û pîremêr zimanê xwe piçekî dirêj dikin:

- keç, jin û pîrejin ji ber nermî û nazikiya xwe, neşên wek kur, mêr û pîremêran xwe bi tundî û bi hêzî bilivînin, ji ber hindê divêt ew xwe ji nêv me bikêşin.

Ya rastî, jin sivik û nerm in, ji lew re, ew digel awazê baş govendê digirin, lê kur, mêr û pîremêr wek dîn û haran xwe dihejin. Ji ber vê ûştê kenîya jinan bi wan têt.

Hêdî hêdî xort jî tene nêv dîlanê, micêwir û pîr jî vedigerine perestgehê.

Şêxaniya xortan berdewam e; destpêka xoşî û evîna wan, germî û tîkeliya wan û hêvî û armanca wan e!

Nîveşev e, dîlan berdewam e, xuhdan e, westan jî ne xem e, jiyan e! Êdî beşek ji xortê nûgehiştî nemaze yên çardepanzdesalî, cot bi cot, ji xwe re piyasê dikin, li ser kayî yan li nêv daran rûdinin û sojê didine hevdu... Carinan di şevên cejin, dawet û tewafan de, keç û kur bêgav dibin ko ji gundî birevin û cot bibin... Ew jî li ser rewşa wan dimîne.

MORKA STIRANÊ

Morka vê stiranê dîlan e, anko bi dengekî nerm û zelal û wek pesteyên heyranokan tête stirandin. Lê di dema berê de, piraniya stiranên vê dîlana şêxanî dengî bûn û diyar e ko nuho kêmtir bûne û morkên dî jî tene stirandin. Dîlanvan peyvên stiranê li hev vedigerînin û demeke dirêj û bê rawestan distirin.

ÇÎROKA STIRANÊ

Çîrok ji naveroka sivik diyar e ko li ser dîlana şêxanî, mîr û şêxên bajarê Şêxan, gundê Baedre, nextê keçan û kesê ko distire navê wî jî Delîl e, yê ko dixwaze digel dosta xwe dîlanê bike.

CIHÊN DÎLANÊ

Ji navê wê diyar e ko ji dilê Şêxan (paytexta êzîdîyan) derkevtiye û belav bûye. Ev dîlan li Mûsil, Badînan, Botan û Hekarî bi nav û

deng e, lê govend gehîştîye Mêrdînê jî. Di ser hindê re, ermeniyên Îranê jî vê govendê dileyizin û bi saya serê kurdên cuhû li Îsraîlê jî cihê xwe girtiye. Gelek corên şêxanî hene û li her cihêkî yan deverekê bi awayekî tête leyistin.

AWAYÊ GOVENDÊ

Mişe awayên vê govendê hene, lê min awayek hîlbijartîye, ew jî ya ko li çend cihên başûra Botan (Ji Zaxoyê ta deşta Mişarê) tête leyistin, anko govend bi vî awayê xwe berbi rastê ve ye, lê hemû govendên Badînan û Hekarî berbi aliyê çepê ve ne. Ev awa jî 12 gavan pêk têt.

BEŞA 1

Awayê rawestanê:

gav û piyên çepê 3 4
gav û piyên rastê 1 2

Govendvan wek trêne destên hev digirin, berê xwe didine aliyê rastê û xwe piçekî diçemînin, piyên rastê du caran hildigirin û du gavan diçin, dest û milên xwe jî dihejin. Anko piyên rastê 1 û 2, piyên çepê jî dûvre. Govendvan berê xwe didine aliyê çepê û dîsan xwe piçekî diçemînin, piyên çepê du caran hildigirin û du gavan diçin, dîsan dest û milên xwe jî dihejin. Anko piyên çepê 3 û 4, piyên rastê jî dûvre. (Du xaneyên muzîkî tene lêdan, an xêzek tete stirandin)

BEŞA 2

8 gav û
7 piyên
gav û piyên çepê 6 5 rastê

Govendvan piyên rastê û çepê li tenîştê hev dideynin (5 û 6), bi piyên rastê pêşve du gavan diçin û piyên çepê dûvre, dest û milên xwe jî dihejin (7 û 8). (çar xaneyên muzîkî tene jenîn, an du xêz tene stirandin)

BEŞA 3

gav û 9
piyên 10 12 gav û piyên çepê
çepê 11 gav û piyên rastê

Govendvan piyên çepê li erdî dideynin û hildigirin (9), gawekê bi paşve vedigerin û piyên çepê li erdî dideynin (10), piyên rastê li ser hêla(xeta) destpêkê dideynin (11), piyên çepê li tenîştê piyên rastê dideynin (12) û awayê govendê hew û tekûz dibe. (şex xane tene lêxistin, an sê xêzên stiranê tene stirandin)

FERHENGOK

hewa meqam
xane xaneyên muzîkî, bi pîvanin
2/4, 4/4 6/8 û hwd.
Baedrê gundek.
pismîr kurmîr.
reşbelek dîlan, sema û govendên me
û nêran bi hev re.
ladin dûrkevin.
ûşt sebeb.
heyranok stîlek ji stîlên jina kurd e
ko bi dengê nerm û zela tete stirandin.
dengî stîlek ji stîlên kurdî ya, ko
ji gewriyê û bi dengê pan tete stirandin.
mişe gelek, tenê ji hejmaran re
tete bikaranîn.
Micêwir nobetdarê perestgeha êzîdiyan e.

Jêder:

1- Ehmed Salih Silo(1951-1991), şehîd bû.
2- Koma Metîna, Baxdad.



HELBESTA ANDRE BRETON

navê her pirtûka girtî ya çî laşî be di xwe de dihêwirîne.

Û her laşek jî pirtûkek e bi ser hemû peyvan û hemû
navan de vekirîye.

ALAN JOUFFROY
Wergerandina ji erebî Dugir

Hinek kes xewnan û têramandin û evînê bi kartînin. Peyva xwe dibêjin û peyvbejiya wan dibe nivîsandina ko êdî nema ji cih û demê têt hilanîn.

Hin kes dibînin, da ko bi dîtina xwe re cihanê hişyar bikin. Dinivîsînin û pirtûkên wan dibin kiryar û bûyer û rûdan û peyamên dîrokê. Kesine bi gavên daçikyayî û bi awakî; ko em nizanin ka berbi kûderê ve diçin, bi rê dikevin. Hevaltî û dilsojiyê, toreyî û bêzariyê nas dikin, û ti carî hestên xwe ji birûbaweriyên xwe; gotinên xwe ji kîrinên xwe cihê nakin. Ji bo şoreşê dijîn, û birîna her kêlikekê; çiqasî hêsan be jî, nas dikin. Li êşên xwe xwedî derdikevin, rabûn û rûniştinên xwe radestî sincên naskirî nakin. Herwisa çêja xwe jî radestî pîvanên zanistîya statîkî nakin.

Weko çawan derbasî hundirê surdarî û matmayînê dibin wisa xwe berdidin kûrahiya anuha û rabirdûyê jî. Lê her û her û hergîz; çavdêriya nîrxine teze û spehîbûnîne nû dikin.

Ji lêbûrînê hez nakin, dişwar û şîndar in. Em dikarin ji wan hez bikin û em dikarin jî ji wan bidexisin, em dikarin ji wan bitirsîn û wan jî ji xwe bitirsînin. Wexta ko em pirtûkên wan dixwînin jiyan têt guhertin. Wexta em bi wan re dipeyivin em sergêjahîyeke nediyar hest dikin. Em gavên wan wînda dikin, da ko em ji nû ve pêrgî wan bibin, pişt re em dixwazin li wan cîgehên kêr çûn û hatin, şînorên xwe ji wan re vekin. Ti carî em naxwazin wan bêhêvî bikin. Kes in; û di vedîtina rêça xwenaskirinê de pir zîrek in. Liserrawestana we berbi rastîyê ve radiperînin, lewra tiştê herî hêja ya ko gerek li hemberî wan bê kîrin ew e, ko em li xweyaxwe vegerin.

Em mîratgirên 'Ez' a wan in. Daxwaza me jî ew e ko em ramanên wan ên dirindane di her amajeyê de, di her bîdengiyê de û di her peyivînê de, bi gewde bikin.

Civak; navê helbestvanan li wan dike. Ew bi xwe guh nadin vê binavkirinê, çinkî peyva helbestvan "tênegihîştinekê durist dike, bi awayê ko her kes dikare vî navî weko çawan di rojên çûna dibistanê de çenteyê xwe hildigirt, hilgire".

Di nîvê vê sedsala bîstan de, ko mirov hewl dide, da ji xapandin û ji ling ji bin şemitandin û ji ser rê birinên jiyanê rizgar bibe, hêjî hin ji xelkê, helbestvanan, wek bûnewerine romantîk û bêkêr, dibînin: (Ji xelkê zûtir hînî dermankirina xêzên nivîsandinê bûne, tiştine nebûyî û bêkok dinivîsinin, ko mirov wan ji aqil bi dûr nexê û bi dilekî paqij piştgiyî wan neke, ti carî wan tiştan bawer nake.) Ew xelkê ji bîr dikin ko Standhal jî wek Gerard de Nerval romantîk bû.

Helbestvan xwedanên dûrbîntirîn û hûrbîntirîn û çaresertirîn pirtûkan in, çinko helbestên wan; ti carî pêwist nakin ko li dawîya rêzên vegotinê rawestin:

Dikarin Peyva "helbest" li hevokeke kurt ko di çêsnê fermana karekî sincî (exlaqî) de be, bikin. Dikarin wek Loteryamon yek malikê jî di helbestê de nenivîsinin.

Dikarin berî hemdemên xwe pêşezanên bûyeran bin; bûyer û rûdanên ko ji mirovatîyê re balkêş û giring bin, dikarin rastiya li pêş dîrokê eşkere bikin, dikarin prinsîpên hişyarî û zanîne angî rêbazan damezirînin; û bi alîkariya sihra wan prinsîpan bandûrê û akamê li jîyan û li ramana xwendevanên xwe bikin. Lewra; hemî tiştên ko wan kesan pêkanîne û pê jiyane û ji jidayikbûna xwe hetanî mirina xwe pê ramiyane jî navê 'Helbestê' lê dibe.

Di nav vê mezinkoma ko çameyan(qesîdeyan) dinivîsinin;

helbestvan kêma in. Hin ji wan ji bilî nivîsandina çameyê di tu tiştî de naramin û bi serhişkî li dijberî nivîsandina pexşanê radiwestin. Helbestvanekî wilo êzingvan e.

Hin zilam û hin jin helbestan nanivîsinin, lê ji gelekên ko helbestê dirêsin nêzîktirî helbestê ne; ji xwedanên "hunera helbestî" nêzîktir in.

Helbestvan ji boyî wan zilaman û ji boyî wan jinan dinivîsinin, tenê ji boyî wan. Çinkî şoreşa rastîn a cihanê û guhertina dawîn a jiyanê, tenê, bi wan ve girêdayî ne.

Helbestvan 'çameyên xwe' mîna hevdiştînan û bûyeran û dîroka zindî ya ko pêwist e bê jiyandin, pêşkêş dikin. Di nêrîna wan de, pirtûk, ne ji bo istihlakê ye lê sîsikeke navendiyanê ye û tirsnakiyeke rastîn bo gerdûn e. Vekirina berhemên wan; tenê hema vekirina berhemên wan, karek e, rê li ber me vedike ko em tiştên xwe yên pêşî û yên dawî li ser bikin.

Pirtûka- Entîke, wek ko helbestvan dibîne, bi naveroka xwe û bi wê sûlava ko berdide hişê xwendevanê xwe, dibe wêneyeke berdest.

André Breton mezintirîn helbestvanê zindî ye -di sala 1966an de miriye-; ev jî ji bo wan kesên ko piştî xwendina Novalis, Nerval, Rimbaud, Loteryamon, Apollinaire, di helbestê de metiriyala ji nû ve afirandineke giştî bo mirov dîtine, tiştêkî bêguman e.

Herwisa bo wan kesên ko di helbestê de şoreşekê dibînin dîsa tiştêkî bêguman e; şoreşa ko di her kîlîkê de û di her demê û di her cihê de bigewde dibe da ko helbest bê merbend û bi azadî diyar bibe.

Tiştêkî bêguman e bo wan kesên ko li dijî helbesta li gorî pîvanên dîrokna û mamostayan nijinandî, radiwestin; dîrokna û mamostayên ko di evîne û di êrotîkê de, di karê siyasî û di jiyana rojane de û di xewnê de, pêdiviyêke bingeîn bo

teqandina her tiştî û hêskirina her tiştî û dubarekirina afirandina her tiştî, dibînin.

Bi kurtî, ji bo wan kesên ko di Firaxên hevlûle de 'Communicating Vessels' wek nimûne, bi taybetî di rûpelê 124 an de ji çapa dawîn, heman ramanê û heman jiyane dibînin, bêguman e.

Berhemên A. Breton wek gaberdekî (hîm, kevirekî mezin) bizavkar ko ti carî naherife, ji hevdû dabeş nabin. Herwiha dahênaneke xweristiyane ye; kîjan balende be û rengê perikên wî çawa bin jî dikare xwe di movikên vê avahiya hendesî ya surdar û yekta de winda bike.

Hîmdarekî wek Breton, di baweriyaya min de, ti carî namire, tenê di bareyekê (haletê) de dikare bê

mihandin, ew jî, eger bi rastî û ji dil navenda rakêşê (cazibiyet) ya ko terazûna wî di vê valahiya dîrokî ya civata li dijî şoreşê de diparêze, bê guhertin.

Helbesta Breton, cara pêşîn, li xewxaneyekê, li rojavayî Fransayê, li ser mesefa xwarinê, wexta ko ji jin û keça xwe re li ser şevê dipeyivî, dest pê kir. Wexta ko di ciwaniya xwe de nameyek bo Paul Valery nivîsandibû, û wexta ko digel Trotiskî li ser 'Ji bo hunereke şoreşgêr û azad' imzekiribû, û wexta ko polisên 'Fîşî' helbesta wî 'Fata Morgana' û pirtûka 'Antolojya tinaziya reş' qedexekiribûn û berbi doravên Antîlê ve çûbû, û wexta ko peyva xwe di kovara anarşîstan de bi 'Cîhana bêsêrûber' dest pê kiribû, û wexta ko di germa cenga Cezairê de bergiriya leşkerên revyayî dikir, û wexta ko dîsa li xewxaneyekê li rojavayî Fransayê rûniştibû û gotarek ji

rojnameya 'Telegram de Elwist' bi sernivîsa 'her roj, Alain Jouffroy, li daristana Holkotê ye, cîranên xwe yên biçûk dibe dibistanê' çirandibû, û xistibû keviya pirtûka xwe ya ko diyarî hevalekî dikir, helbesta wî dest pê dikir.

Weko çawan ba hergav, ko bibe baran û mij û seqem jî, ba ye, Breton jî hergav helbestvan e.

Di nêrîna wî de; helbest, pêşeroja mirov e. Çameyên (qesîde) wî -ko pir kêr belavdikirin û dubarekirina belavkirina wan jî nedipejirand- jêder û palpišta camane ya dîrokekê ne ko ji dîroka wî berfirehtir in.

Yek ji stûnên wê cîhana ko xwe bi ser me de diçemîne, dîroka hevokên Breton e.

A. Breton



Bila hostayên wêjeyê netirsîn, çinkî ev cîhan pir guh nade wan û ew bi xwe jî vê yekê qet nizanin. Dîsa jî bila nasyarên helbestê û rexnegirên pisporekê wêjeyê vê yekê bawer bikin: Ev cîhan, li hemberî hemî viyanên prîmîtîv, rapêrîneke giştî ye. Tu sedem nîne ko ew jî xwe tevî vê sergermiyê nakin.

Çinkî helbest, wexta ko civatê rexne dike, û bi sergermî, giyan û lêş, ramanê û rastiya zelal jî hev cihê dike, wê çaxê, bi vê karîna xwe ya yekane, vekirina xwe, ya bi ser cîhana ko bédengiya wê ya kurt helbesteke békutayî ye, diçesipîne. Helbesteke békutayî, ew helbest e ko Sopo û Breton beriya pênc salan jî jidayikbûna suryalîzmê wê dinivîsîn. Wexta ko di sala 1919 an de li wî dengê dirûnî guhdarî dikir; dengê ko bi tena serê xwe dikarîbû nivîsandina mēkanîkî biasfirîne. Hemû helbestên Breton ên ko li pey (Bexçeyên polayê) hatine nivîsandin, hetanî kēlîka ko di Dîsembere sala 1933 an de ragihandiye ‘ko dîroka nivîsandina mēkanîkî ya suryalîzmê - bêtirs dibêjim- dê bibe sosre teke berdewam’ helbestine ramanî ne, ramanek e û xwe bi xwe, bê mebest, jî bilî mebesta vedîtina ramanê bi xwe û rizgarkirina wê, xwe davêje nav êgir.

Piştî wê bi çar salan, digel wê jî, hevokine kurt jî “Gula berbero” ya ko di sala 1923 an de nivîsandibû; di sibehekê de dema ko serê xwe dişûst, tēn bîra wî û li hemberî vê baweriyê radest dibe:

“Helbestên avêtî, yēn ko jî durvên wan ne razî ye û di nav rûpelên dîwana “Debançeya por sipî” de nîn in, mîna ko jî cihekî nediyar hatine. Helbestine bêagahî ne, hestan ranaperînin. Helbestine di çesnê hewldanîne sergerm û serseriyane

yên di hundirê deryayeke har û tevlihev de ne.

Ew hevokana peyv bi peyv, wêne bi wêne tēn bîra Breton, tēn bîra wî û dizane ko bi evînbaziyên wî re diguncin; evînbaziyên ko di seyranêke şevînî de, li nêzî keleha San Jack, ew bi karanîbûn, û di wan de jiyabû.

Li vir, em dibînin ko sosreta nivîsandina mēkanîkî dikare jî ber xwe ve, bi derengî be jî, bête guhertin, û bibe hêvî.

Bext (şans), bextê afsanewî yê ko mirovek bîrtûj bi destdixîne û digihêjêyê di vir de ye, ko di afirandina çemê peyv û wêneyan de xwedanê coşiyêke zikmakane be, û nivîsandina mēkanîkî jî di vî warî de, jî bo bext, dergehekî nîv vekirî ye, tēgihiştina tiştên ko di pêwistiyê de nayên tēgihiştin, e.

Qelaştina dîwaran e, dîwarên ko takekesiya (ferdiya) neşoresgêr wan di navbera mirov û cîhanê de, di navbera aniha û dahatûyê de, di navbera zîlam û jinê de, di navbera rastiye û xewnê de, ava dike.

Bi awakî rasterast, Breton nivîsandina jî bo jiyanê ye, û jiyanê nivîsandinê ye.

Nivîsandinek e; çepera asê ya keştiya ko bēguman dê binavbibe û li dijî bahoze berxwedanê dike, diherifîne.

Di navbera prinsîpa nivîsandina mēkanîkî û awayên bikaranîna wê de tevliheviyek heye. Lê yê helbestvan dizane ko ev prinsîp dê dûrî hemî awayên asê yēn nivîsandinê û dûrî hemî rê û rêbazan bimîne. Wek kilîta azadiya ramanê ko bēyî wê tu tişt jî bilî mirinê namîne, dê bimîne.

Breton bixwînin: Di hevoka wî de, mîna hişmendiya di zelaltirîn qonaxa xwe de, jiberxweveyî û zikmakayî dipijiqin. Hizrên xwe yēn dadayî û bangên xwe li ser hevokan ferz dike.

Çameya Breton, bi vê rîtmaya xwe û bi vê zelaliya xwe û bi vê payedariya xwe, di hebûna xwe de xwe dispêre yasayeke

xweser û yekane: Dilbijandina herî giranbuha.

Semageriya giyan ya bi lêş ve girêdayî ye, û semageriya zeynî (zihnî) jî ji bo bûnewerê mirovî, bi gelemperî, derbasbûna metirsiyên ko ti carî bawer nedikir ko dê zora wan bibe, pêdivî ye.

Pêşveçûn, ji 'RAZ' hetanî BAYÊ AVÊ' ne bi awakî rêkûpêkane ye. Deng jî hergav ne di yek çêşnî de ne. Malik berya niha nehatine bihistin. Matmayîn bi awakî berz amade ye.

Plana pêşîn a çameyê ya ko rev jê nîn e ew e ko, hewldana yekemîn a nivîsandina çameyê biryarê li ser her tiştî dide: Li ser çawa destpêkirinê, li ser rîtm û beşavendê (qafiye- theme), li ser guhertin û rawestek û bandûrên wê.

Hişmendî û ramyariya Andre Breton jî ji vî pêk tê ko dizanîbû çawan desthilata fermanê pêşkêşî wê hewldana yekemîn bike, çinkî bêtî vî yekê jî, kîjan helbestvan be dikare şansên xwe yên ji helbestê winda bike.

Helbestvan e û teorîzanê vî mîkanîkê ye; mîkanîka ko xirecir û tevliheviyeke bê veger xistiye rêbazên nivîsandin û ramanên kevnare de.

Andre Breton, tenê, di nav helbestvanên şoreşgêr de yên ko li Fransayê di dawîya sedsala 19 an de ji dayik bûne, dikare mezintirîn helbestvan be. Breton di sala 1896 an de hatiye dinê.

Helbestvan û teorîzanê vî mîkanîzmê, A. Breton, cara pêşîn helbestê- ji De Lautrèamont û vir digihîne rexê dîtir ê babetên wêjeyî, û cara pêşîn jî piştî Apollinaire bran (burhan) kir ko helbest ne hema di pirtûkê de têt bi cîkirin, lê pirtûk jiyan e, kolan e, hevdiştin e, rûdan e, bûyer e, û ji ber ko ev tişt hemî ne,

pirtûk; em bivên nevên dê wisa be, bi taybetî di wê pêvajoya ko, dem û cî, tê de, wek agahî û ezmûneyeke berdewam bin; ezmûneya wê rastiya ko hêjî li ser piyan ranewestiyaye, û rastiya ko xwe ji meşê re amade dike.

Lewra 'realîzm' ko hergav şanoya sîbereke hejar bû; îro mezintirîn xapandinên çandê ye; ji wan xapandinên ko mirov xwe bi xwe xwe pê dixapîne. Li hemberî vî jî, hizir û bîr û prinsîp û teoriyên suryalîzmê ji berhemên xwe tekûztir û hêzdartir in. Ji vir û pê de, suryalîzm wek destpêka ramana pêşerojê û wek sînorê ko mirov nema bixwaze di hundirê hevokên mirî de û di hundirê vî sîbera çandî ya ko jiyan a wî ya hişmendî û zeynî û evînî û siyasî dixeniqîne, bijî, xwe pêşkêş dike.

Dê ji me re bibêjin ko suryalîzm berya çel salan li ser piyan e. Emê bibêjin ko komunîzmê not û şeş salan bendewariya serkeftinê kiriye, herwiha emê bibêjin ko ji çel û du salan ve em di çêşnê Komûneke ramanî de dijîn, Komûnek e, û li Versailleseke dîtir ko roj bi roj çekên wê û nokerên wê pirtir dibin, dorpêç kiriye. Komûnek ko di rewşa xweparastinê de be, ti carî bi rêkûpêk nabe.

Ez di wê baweriyê de me ko azadiya lêş û azadiya awez (aqil) dê 1917 eke taybetî ji bo xwe bi destxînin, û ev 1917 eya han béguman dê zora 1879 an -mebest sala Komûna Parisê ye- bibe.

"kevana sipî ya ko li ser pişteke rêş hatiye nîgarkirin û em navê ramanê lê dîkin" bi tu kesî ve negirêdayî ye, hetanî bi xwediye xwe ve yê ko afirandiye ji girêdayî nîn e.

Cîhan û xwîn û raman, di nêrîna helbestvan de yek tişt in, tu diramî, (difikirî) dêmek tu di cîhanê de xwînê dirêjî.

Û Bretonê ko bi awakî mat û balkêş daye nîşankirin ko "de Lautrèamont û Rimboud du teorîzanê dijwar in" dibîne ko ne

hema gerek her kes helbestê
binivîsîne lê li her cihê û di hemî
barûdaxan de û bêyî cihêwazî
(istisna) gerek bête nivîsandin. Eger
helbest li cihekî ji cihan rawestiya,
eger sînor ji bo helbestê hatin danîn,
dê helbest ji jiyane bête birîn û
helbestvan bixwe jî di hebûnê de dê
raweste. Wê çaxê çareya yekemîn, bi
rastî, xwekustîn e.

Madam raman li ser piyan e, û dikare
bi rê ve biçê û madam nivîsandina
mêkanîkî, eger gotarek e seyr di
rojnameyekê de be, hevpeyvînek e
bêdeng hetanî destê sibê bi jinekê re
be, yan jî li ser keviya qutiya
cigareyan nivîsandî be yan jî li
girtîxaneyê be, dikare dengê xwe
bigihîne, Madam bext berfireh e û
madam hevî û bêhevîbûn di mêzênê
de ne, tenê şiyana helbestê dimîne
da ko mirov bikaribe di tunebûna
xweşî û evîne de ziyaneke zorbaz
nebîne,

Di xemgîntirîn û di jwartirîn
barûdoxên, ko reng e (belkî)
helbestvan di wan re derbas bibe de,
rêkewt(sudfe) û bext hene. Ev
pevgirêdana seyr a di navbera
pêwistiya xweristî û pêwistiya şexsî
de heye; bi taybetî cihekî hevdûbirînê
heye, cihekî giyanî û cihekî di fîzîkî
hene û di van cîwaran de xebatkarên
Komûnê ramana ko ez li ser
dipeyvîm, radiperînin.

Di van cîwaran bixwe de Breton tişta
ko nivîsandiye nivîsand û tişta ko
jiyaye jiya. Tişta ko ji yaye nivîsand, :
'Nadja', 'Stûnên 17', 'Elewanî
Elmustetreqa', û tişta ko nivîsandiye
jiya: 'Daxuyani', 'destpêka rojê',
'Evîna şet', 'Kilîta revê', û di
'Hejariya realîteyê' de rastiya ko her
tiştî dinixumîne û tu tiştî cihê nake,
dixuye.

Hemî helbestên Breton û hemî
helbestên rastîn wek rêkewteke

(korfelaqiyêke, sudfeyêke) ne subjektîv û
ne jî objektîv dikarin bîn pênasîn,
rêkewteke ko hilperikîne diafirîne,
rêkewteke e, û 'berê kûrahiyê' tê de
berbiçav e.

Li vir, li ser rûpel, wek ko elend bi ingirîn
û bi kevokan hatibe dabeşkirin, wek ko
pinpinîkan bi ser çirê de bibarîne; çira ko
jineke evîndar li jêr wê rût û bi dilgermî
rûniştiye.

Helbestên Breton bixwînin, hûn dê demê
û şûnê, ji hevdûrketin û pevgirêdana
henasan (nefesan) û ramanê bixwînin.
Hûn dê hemî zivirandinên dema zeynî
(zihnî) bijîn, ko bêyî wê dê jiyan rêçêke
kurt î bê mebest be.

Suryalîzim wek dergehê takekesiya
şoreşgêr, ne dibistan û ne jî rêbaziyeke e, û
ne jî dikare bibe formek ji formên
derbirîna çandî.

Gelek helbestên ko cara pêşîn ji sala 1921
ê de li vir di 'ronahiya zemînê' de belav
dibin, tu tiştî dernabirin, û ne jî dixwazin
tu tiştî derbibirin. helbestvanê mezin
derbirîne nake lê dibêje û dipeyive. Bi
peyvîna wî û bi nivîsandina wî azadî dibe
şepalek û cihan jî dibe şerek, dîrok jî
hemû dergehên dihejîne û hemû zindanan
diherifîne.

Takekesiya şoreşgêr, di baweriya min de,
"pir jidayikbûna ezê" ye, li hawirdora wê
û carcaran bi awakî nakokane û cihêreng
gelek hişmend û behremendên hevbeş
dicivin: San Gost, de Sade, Max
Shternar, de Lautreamont, San Paul û
Breton, Antonin Artaud, Patay, Henri
Michaux. Ez dê li xwe mikur bêm, û ji
xwe, dê kutahî jî li vir be, helbesta Breton
navê her pirtûka girtî ya çî laşî be di xwe
de dihêwirîne. Û her laşek jî pirtûkeke bi
ser hemî peyvînan û hemî navan de
vekiriye.

* Alain Jouffroy ko yek ji hevalbendên Breton
bû, ev nivîs di 3 yê temûza 1966an de wek
pêşgotin ji bo pirtûka Breton a bi navê Ronahiya
zemînê, nivîsandiye.


ÇARŞEMA XWELIYÊ



*T.S. Eliot
compendium Charles Hargrave*

Çinkî careke dîtir hêviya min û
vegerê nîn e
Çinkî hêviya min nîn e
Çinkî hêviya min û vegerê nîn e
bo dilbijandina xelata vî zilamî yan jî
bo mebesta ewê dîtir
êdî ji bo bi destxistina wek van tiştan
nema xwe diwestînim
(ji bo çi gerek bazê pîr baskên xwe
vegire?)
Ji bo çi gerek ez jî bi ser hêza ko
winda dibe
ya desthilata naskirî de binalim?
Çinkî hêviya min û ji nû ve naskirina
payedariya dudil a katjimêra
bêguman, nîn e
Çinkî nahizirim
Çinkî dizanim ko hîç ez dê wê
takehêza rasteqîn
a ko berbi nemanê de diçe, fêr nebim
Çinkî ez nikarim vexwim
li wir, ko dar dipişkivin, û çavkanî
diherikin,
Çinkî hîç tişteki din di pey re nîne.
Çinkî dizanim ko dem hergav dem e
Û Şûn jî hergav û tenê şûn e
û tişt a rast jî, tenê carekê û tenê ji bo
şûnekê rast e
Ez dîlşad dibim çinkî hemî tişt wek
divê çawa bin wisan in
û rûyê xwe ji ber rûyê pîroz didim alî
û guhên xwe ji ber deng digirim
Çinkî nema dikarim hêviya vegerê ji
nû ve bixwazim

lewra bi avakirina tişteki ko xwe pê dîlşad
bikim
dîlşad im
û berzûrî xwedê dibim dako me bi
dîlovaniya xwe binixumîne
berzûr dibim dako wan pîrsgirêkên ko
xwe bi xwe guftûgo dikim, û di
şirovekirina wan de kûr dibim, ji bîr
bikim
çinkî hêviya min û vegerê ji nû ve nîn e
Rê bide van peyvan ko bersivê bidin
dako rûdanên ko rûdane careke di
rûnedin,
hêviya min ew e ko fermana qederê, li ser
me, ne pir giran be
çinkî ev baskana nema baskên firînê ne
tenê bawesînkên lêdana bê ne
ew bayê ko aniha lawaz û zuha ye
ji viyanê lawaztir û zuhatir e
me fêr bik ko em guh bidin û guh nedin
me fêr bik ko em bi hêminî rûnên.
Ji bo me gunehkaran anuha û kêlîka
mirina me nimêj bike
ji bo me aniha û kêlîka mirina me nimêj
bike.



II

Xanima min, sê pilingên sipî li bin
dara kajê rûniştin
di seqema rojê de, piştî ko kerixî bûn
Piştî ko têra xwe ji lingê min û dilê
min û kezeba min
û ji naveroka qafê min xwaribûn

Û Xweda got ma gello dê ev hestî bijîn?
Ma gello dê ev hestî bijîn?
Û ew tişt ko di hestiyan de hatiye hilanîn
(ko ji berê de hişk bû) bi zîqezîq got:
Ji ber durustiya vê xanimê
ji ber nazdariya wê,
û çinkî di têramandinên xwe de Meryem
payedar dike,

Em bi ronahiyê diçurisin. ez ê ko li
vir nexuyayî
Berhemên xwe bo jibîrkinê
Û evîna xwe jî bo nijada biyabanê û
ji bo mêweya kundirê
pêşkêş dikim.
Yê ko tendûristiyê li hinavê min û
tayên çavê min
û beşên ko piling nema dikarin wan
bixwin, vedigerîne, ev e
Xanimê di çariya xwe ya sipî de berê
xwe da têramandinê
De bila sipîbûna hestiyên jibîrkinê
bibexşîne.
Çi jiyân di hestiyên de nîn e.
Ji ber ko ez jibîrbûyî me
Û ez dê jibîrbûyî bibim,
lewra ez dê ji bîr bikim
wisa ez xwe ji bo armancê terxan
dikim û tê de dihilim.
Û Xweda peyamek bo bayî got
Tenê ji bo bayî
Çinkî tenê ba dikare guhdarî bike.
Û di bin barê sîsirk de bi zîqînî
hestiyên dest bi stiranê kirin,
Got
Ey Xanima bêdengiyê
hêmin û melûl
jihevketî û pirr hev girtî
Ey gula bîranînê
Ey gula jibîrkinê
Westayî û jiyân bexş
Lerzok û aramkêş
Gula yekta û bi tenê
Anuha gulistan e
gulistana ko hemî evîn tê de bi dawî
dibin
Û renckêşana evîna netêrbûyî bi dawî
dike
Û renckêşana mezintir a evîna
têrbûyî
Dawiya bêdawîbûnê
Gera berbi bêdawayî de
Dawiya hemû tiştên bêserencam e
Axaftina bê peyv e
Û peyva bê axaftin e
Sipas bo dayikê

Li ser wê gulistana
ko hemî evîn tê de bidawî dibin.
Li binya dara kajê hestiyên belavbûyî û
ronakbûyî stiran digotin
Em kêfxweş in çinkî em belavbûyî ne,
çakiyên me bi hevdu re pir kêmbûn,
li binya darekê, di seqema rojê de,
Digel pîrozmendiya qûmê,
Xwe û hevûdu ji bîr kirin,
Û di hêminiya biyabanê de hevûdûgirtin.
Zemîna ko em dê wê bi hilbijartinê li
hevdu dabeş bikin ev e,
ne dabeşkirin û ne jî yekgirtin giring in,
zemîn ev e.
Me mîratgiriya xwe bi destxistiye.

III

Li cem zîviroka yekemîn a mêrdewana
diwemîn
ez zîvirim, min li jêra xwe dî ko
heman formî xwe li perjana nêrdewanê
alandiye
li jêr dûkelê di bayê genî de
Digel Şeytanê mêrdewanê
yê ko rûyê derewîn ê hêviyê û aramê li
xwekiribû,
pevçûn dikir
Li cem zîviroka diwemîn a mêrdewana
diwemîn
min ew çemyayî, û berbi jêr de zîvirandî;
hiştin
tu rûyên dîtir peyda nedibûn, û mêrdewana
jî tarî bû
hêwî bû; wek devê pîremêrê ko girêza wî
diherike,
ko tu hêviya wî û durustkirinê
tunebe, derizî bû
yan jî wek gewriyeke mişt diran a
gamasiyekî pîr be
Li cem zîviroka yekemîn a mêrdewana
siyemîn
pencereyeke şikestî di çesnê hejîrek e
nepixî de, hebû
û li paş bişkoja stiriye û dîmena çêregehê
Durvek e navmil-pan a bi şînahî û
keskahiye rapêçayî



bi zurnrya kevnare
dest bi xapandina Gulanê kir
Porê belavbûyî ciwan e, Ew porê
qehweyî
yê ko li ser dev û lêvan xwe li ba
dike,

Yasemîn; kêf û henek, dengê zurneyê,
rawestan û gavên aqil li ser nêrdewana
siyemîn,
winda dibin, winda dibin,
hêza ko
destê hêviyê û ûmîdê nagihêjê
hildiperike nêrdewana siyemîn.

Xwedayo, ez bêkêr im
Xwedayo, ez bêkêr im

Lêbelê hema peyvê bibêj.

IV

Yê di navbera benefş û benefşê de
meşiya kî bû
Yê ko di navbera
pileyên cihêreng ên hişîniya
rengereng meşiya kî bû
bi sipî û bi şîn, û bi rengê Meryem
dimeşe
Li ser tiştine bêkêr dipeyive
Yê ko di nav xelkê de dimeşiya kî
bû,
Nexwe, kê ev avpij dolmendkirine
Kê ev avpij wisa geşkirine
Seqema tehta zuha û bicîkirina qûmê
çêkir
Di şînahiya gîhê de, şînahiya rengê
Meryem,
Soveгна vos
Li vir in salên ko di navberê re
dimeşin, barkirî ne
Li wir kemeşê û bilûr, xwe nû dikin
Yê ko di navbera razan û hişyariyê
de
di demê de dilive, barkirî ye

Ronahiyeke sipî û hûnayî, wê
dinuxumêne, li hev dipêçe.
Salên teze derbas dibin, xwe nû
dikin
Di nav ewrê hêşran de yê çûrusandî,
sal, xwe nû dikin
Helbesteke nû bi beşavendeke
kevnare. Azad dike.
Dem. Azad dike.

Didariya di xewnên bilind de nayê
xwendin
Lê di wê wexta ko gamêşên bi
gewheran xemilandî
galîska zêrkirî ya veşartina miriyan
dikişînin.

Xuşka bêdeng a bi sipî û şîn rûrapêçayî
Di nav darên merxê, li paş xwedayê
gulistanê,
Ko bilûra wê bê henase, serê xwe çemand
û nîşan da,
lê bêtî peyivên axivandî.

Lêbelê avpij derbû û balendeyî stira
Demê azad dike, xewnê azad dike
Peyva axivandî nebihîstî, negotî

Hetanî ko bager hezar kurtepiştên dara
merxê bihejîne

Û tarawgeha me jî pişt re bê.

V

Ko peyva windabûyî winda bûba, ko
peyva bikarhatî bikarhatiba
Ko peyva nebihîstî û negotî
nehata gotin, û nehata bihîstin;
Dê bimîne peyva negotî, peyva nebihîstî,
peyva bêpeyv, peyva di cîhanê de û ji bo
cîhanê;
Û ronahî di taristanê de çûrusî
Û li dijberî peyvê hejî cîhana
bi hêçketî
li hawirdor navendeya peyva bêdeng
berdewam dibe.

Ax ey gelê min, min çi ji te kiriye

Peyv dê li kû were dîtin, ma gelo
dê li kû deng ji peyvê were?
Ne li vir, çinkî bêdengî têr nake
Ne li ser rûpelê deryayê û ne jî li doravan,
û ne jî li beja serekî, ne li biyabanê
û ne jî li zemîna baranbûyî
Çinkî ji bo wan kesên ko di taristanê de
dimeşin
Çi ro li nîvro be yan jî bi şevê be
Dema rastîn û şûna rastîn ne li vir e
Ji bo wan kesên ko xwe ji ber rû didin alî
cihekî bi xêr û bîr nîn e
Ji bo wan kesên ko di nav xirecirê de
dimeşin û deng didine mandelayê

demeke ji nû ve kêfxweşî nîne
 Ma gelo xuşka bi serrûk ji bo wan
 kesên ko di taristanê de dimeşin
 û li dijî wê radiwestin, nimêj nake,
 Ew kesên ko sedsalê, di navbera
 demsalekê û demsalekê de,
 çax û çaxekê de,
 katjimêr û katjimêrekê de, peyv û
 peyvekê de, hêz û hêzekê de,
 diçirnin.
 Ew kesên ko di taristanê de
 bendewariyê dikin?
 Ma xuşka rû bi çarî ji bo
 zarokên li ber dergêhê ko dê
 dûrnekevin
 û nikarin nimêj bikin, dê nimêj neke:
 De ji bo kesên hîlbijarte û yên li dij
 rawestayî nimêj bik

Ax ey gelê min, min çi bi te kiriye.

Ma dê xuşka rû bi çarî di nav darên
 merxê yên bejinzirav de
 ji bo kesên ko wê diêşnin nimêj
 neke,
 Kesên ko hatine hîlbijartin û nikarin
 teslîm bibin
 û li beramberî cihanê biçespînin
 û di nav kevîran de bidine
 mandelayê
 Di biyabana dawîn de di nav kevîrên
 şînî dawîn de
 Biyaban di gulistanê de ye, gulistan
 di biyabanê zuha de ye
 Navika çelmîsî ya sêvê ji devê xwe
 davêje.

Ax ey gelê min.

VI

Digel ko hêviya min û vegeêrê ji nû
 ve nîn e
 Digel ko bêhêvî me
 Digel ko hêviya min û vegeêrê nîne
 Di navbera têkçûn û bîdestxistinê de
 diçim û tîm

Di vê tengerêya kurt de ko xewn derbas
 dibin,
 elenda xewnên xaçkirî di navbera zayîn û
 mirinê de
 (Min pîroz bike Yabo) digel ko ez
 naxwazim
 ko van tiştan bixwazim
 Ji pencereya pan berbi perava kevirî de
 Keştiyên bayî yên sipî berbi deryayê de
 difirin,
 Baskên neşikestî berbi deryayê ve difirin
 û dilê windayî hişk dibe û ji nû ve dîlşad
 dibe
 Di yasemîna windayî de û dengên
 windayî yên deryayê de
 û giyanê lawaz dest bi serîhildanê dike
 Çinkî kopalê zêrînî çivandî û bîna
 windayî ya deryayê
 dest bi vegeerandina qîjeqîja evdal û
 nalanala tîtirwask dike
 û çavê kor formên vala di nav dergêhên
 hestîni de
 çêdike
 û bîn çêja şor ya zemîna qûmane nû dike
 Ev dema lerza di navbera mirin û zayînê
 ye
 Cihê tenhatiyê ko sê xewn di navbera
 kevîrên şîn de dibuhurin
 Lêbelê wexta ko dengên wirayî ji
 dara merxê bijenin
 Bihêle ko dara merxê ya dîtir bijene û
 bersivê bide.
 Ey xuşka evrandî, ey dayika pîroz,
 Ey giyanê avpijê, ey giyanê gulistanê,
 Bihêle, da ko em bi sextebûnê henekên
 xwe bi xwe nekin
 Me hîn bik ko em guh bidin û guh nedin
 Me fêr bik ko em bi hêminî rûnin
 Hetanî ko di nav van kevîran de be jî,
 Aştiya me di viyana Wî de ye
 û hetanî ko di nav kevîran de be jî
 Xuşkê, dayê
 û ey giyanê çêm, û ey giyanê deryayê,
 Nehêlin ko ez bême cihêkirin
 û bihêlin ko qîrîna min bigihêje Te.

RÊVINGÎ, BÎRANÎN Û MIRIN



Yûnis Elhakîm

WERGERANDINA EHMED HUSEYNÎ

Dayika ko di rêvingiyekê de gazî min kir,
Bi keziyan û bi hinê xemilandî bû, dayik!!
Wexta ko min biryara hevdfîna di sîbera goreke
nêzik de, wergirt,

Ko min biryara xwe da,
li ser keviya şevêkê bûm.
Û min mirineke rewan vexwend
Dako xatir ji evîndaran bixwazim
Evîndarên ko min razên xwe
bê şerm

li nik wan hiştine.

Lê, tenê,
dilê ko bi ser zemînê de çemiybû
Ew dil, ey hawar!! Diya min bû.

Ew rêving jî,
pêdivî bayekî ye
Bayekî ko ne di çêsnê wî de be.

Pêdivî pencereyekê ye,
pencereyeke fireh mîna rojê.

Pêdivî pûngeke şikestî ye.

Û piştî mirinekê,
pêdivî, da ko bibîne, pangaveke teng e.

Ew koçber

Ew mişext

Bêrîkirinê bi kartîne.

2.11.1996

Şêwaz



II

Ji sala bûrî pêtir ji te hez dikim
 Û aniha hewcedarî te me.

Da bi hev re li bexçan bigerin
 Li ser evîna xwe ji te re bipeyivim
 Û tu jî li ser evîna xwe..

Û mîna ko çawan me hevûdû dît
 Em dîsa di xirecîrê de winda bibin

Mîna ko em ji ti kesî re
 li ser evîna xwe nepeyivîne
 Mîna ko em ji dayik bûbûn
 Mîna ko aniha dimirim.

Çendîn ji te re gotibin jî lê
 pêtir ji te hez dikim.

Û hewcedarî te me
 Mîna ko hergav li bexçeyan
 bi tenha xwe digirim

10.3.1997

DI TERKÊN DEMÊ DE

Hiş!
 Kerixî ye
 Ji ramanên revok,
 Û axînên xiloxavî
 Ditarînin pêûseke kulbûyî
 mîna kwînêreke şewtokî
 Nepixî ye!
 Ji merez û edaaab
 Ji kerbê kurbûna feleka xezeb rê...j
 û kişandina derdên bê gooor.
 Di nav destên min de
 Bi herq û xel
 divêşe..
 Li rûpelekî daxdayî
 Ji jangotinên helbesteke
 birîn nederûtî..
 Diherike
 Derbûye
 Ne qemûş digire
 û ne jî
 di kolanên biyanîyê de
 dikewe!!

II

Û şev
 Bi bêhedana tenêbûnê re
 Kerekorî diponije
 Li ber lorîna bayekî xilmaş
 û barîna
 peşkên baraneke westiyayî
 xwe werkirî di kuje.
 Ji esmanê xweziyên min ên fetisî
 Avî xwe lê pêçaye.
 Hêdî hêdî
 diteptipîne yarîka min
 Dîsa jî..!
 Neqerimandin



Yûsivê Cerihî



Niqniqandina çavên şiyariyê,
 û ne ez hembêzkirim
 xewa avis a radayî
 ne jî xewnên min
 bi tevzînokên bêrikirinê re
 zan...!

Û hêviyên qurifî
 Pelixandine can!
 Qermiçandine dilê....
 jiyanekê kelmkotî,
 belqitiye

Û temenê min termekî ji kêr bûye
 Bi keftelesta rojên mirî re
 Ro...biro

Xewr dibin
 di terkên demê de.

10.10.1995

NAMEYA DILEKÎ BI KUL

Mehmûd Iko



Dem ne dema te bû, lê birîn
birîna te bû.
Te bi bêhnên hemî buharên
temenê minî qurmiçî xweziya
arama mirinê dipîşkivand. Te
hestên minî rîzyayî bi evîna derdên
xwe yên birîndar avdidan, rûpelên
payîza min û te hêsrên rêwîyan
dianîne xwar, bi wê hezkirina xwe
ya ciwan heyvên dilê yaran geş
dibûn, bi daxwaza pakrewanekî di
bêhnên xwe yên dûmanî de be, te bi
nerîna çavekî westiyayî temaşê
dikir, bi evîna derdên keçeke di
keçkaniya xwe de avis dima, hemû
bi damarên te ve daliqandî diman, û
te ew li dor dilê xwe yê mezin
dorpeç dikirin,
ezmanê xweziyên xwe
dixemilandin, geh bi hêviyê û geh bi
poşmaniyê, dengê ba û baranê pir pê
xweş dibû, buhar dihate ber çavên
wî, ji xwe re digot: Ez dizanim ko
buhar nîşana azadiyê ye, hêviya
xweşî û şahiyê ye, gelo ev buhar
dîsa dê weke ya...?
Mixabin ta niha jî buhar nebûye
mêvanê min û ez bi rojê wê şa
nebûme.
Di cihê xwe de diçelmisî, ji xwe
dipirsî: Gelo çima ez bi tenê mame?

Yara min a ciwan!
Tu kanî?
Kê tu ji pêxêla azaran revandiyî?
Ez dê çawan te bigihînim dilê
aşîxwazan, ez dê bi çi rengî te
bigihînim mafên mirovan?
Ez bi tenê mame?
Girtiyê tenêbûna xwe dima.
Pêdiviyên xwe pûç dikirin. Stûnên
ezmên ji dengê zayîna zarokekî ko
nabûna xwe diyar dikir, diherifîn, û
bi nalînên birîndarekî ji xwe re
digot: Ev xirecira li dora min çi ye?
Ev netebatî; netebatiya mêjiyê
bêgane di serê min de çi ramanê
dilorîne?
Ez birçî me, ez tî me. Na...Na, ez
nexweş im, min ta girtiye, ma taya
mirinê ye, ma gelo ez dê bimirim?
Destên xwe diguvaştin û bi gezan
lêvên xwe birîn dikirin, destê



ramanê dihejand, dibeşîşt û bi
kurtepişt jê re digot:
Dem ne dema te bû lêbelê birîn
birîna te bû!

Di wê bêdengiya xwe de dima,
dipûnîjî, li tûrê derdê bapîran
digeriya, bi dilekî tije azar; berê
xwe bi ezmanê odeyê ve dikir, bi
dînbûn digot, bi gotinê re hêç dibû:
Ez westiyam. Di mirinê de dijîm!!

Hingê hêsrên wî xweber dihatin
xwar, bi ser lêvên wî de dişemitîn,
ew şorbûn pê xweş dibû, daxwaza
xwe bi himbêzkirina yara xwe
dikir, xewnên xwe dikirin nameyên
dilekî bi kul, û ji xwedayê evînê re
rê dikir, şahiya kewan dibû sirûd,
dengê bêdengiyê dibû zengilê
bîranînê, jibîrkinê.
Poşmanî dibû şahê bêcare!



Dilyarê Dêrikî

Ey periya ko
 di xewnên min de
 ji xewnan mezintir e...
 Ey weşên evîna di jena dil de,
 çendî,
 min ji te hez dikir, bedew yarê!?
 Hez kirina serokên rojhilat
 bo girtîxaneyan...
 Ey îmana çerxa bîstan
 di wêneyên xwe de.
 Ey kenê şîrmijekî di hembêza dayikê de
 çendî,
 Ez li ser te ditirsiyam!?
 Tîrsa diktatorekî ji belavbûna
 azad ramanan,
 ji zayîna peyvan di nav lêvan de.
 Ew dilyar bû,
 çima me dil zîvar kir
 Peyv pûç kirin.
 Me yar kir neyar. Çima?
 Ey kûrahiya lavijên pîroz, di sîngê de!
 Ey derbasbûna dînetiyê, di himbêzkirinê de!
 Ey kêlîka di navbera hişyarî û sermestiyê de!
 Tu bûyî zelalbûna rondikan; di çavan de.
 çendî
 Zor e, bedew yarê!?
 Çav bibin kulekeke cam
 Rondik bibin 'modêrinek'
 ji evîna van deman,



Ji kûrbûna şînen di çavan de.
 Ew dîlzar bû
 Çima me jiyan lê sar kir
 Şîn kir miradê wî
 Me ew bê per û bask kir
 Çima?
 Tu bûyî diyariya yezdan, di temen de
 û bişkoja şahiya kulîlkan
 wa tenikbûne
 Dilyar e ji periyekê hez dikir
 Wa periya di xewnên min de
 Mixabin!
 Tu ji min re bûyî girtîxane
 û ji kuştina beşûşiya li ser lêvan re..
 Ew xembar bû,
 Çima me xewna wî ya bi tenayiyê xaç kir
 Sêdarkirin hêviyên wî
 Di buhara wî de, me ew pîr û kal kir, çima?
 Tu bûyî xwedaya dîlberan
 Ew bûn... Em bûn... Ez bûm
 dilekî agirpij û dildar..
 Te OLEN xwe serjêkirî hiştin
 Tu bûyî kujyara xewnên
 di malzaroka hêviyan de.
 Tu bûyî pêkanên Wêrdekyanê
 Min û xwe bê zindan
 weke tîlên dirihî
 Li dor hustiyê min
 Bawer be bedew yarê
 Yezdanê ne dîlovan be
 Ehrîman e.
 Bawer be, ew dîlbera neparêze
 peymanên xwe, dibe keça şevan
 Bawer be, ne bawer be
 Bedew neyarê!
 Te ev dem nekir dema min
 Ev dem ne dema min e; bi carekê re.
 Demsalên min hatin; bêbuhar
 Nêvî av im, nêvî agir im...
 Yara min bûye neyar.



2.6.1995

LEŞKER

Ji folklorê finlandî
wergêr Zagrosê Hajo

Dibêjin, ko carekê yekî leşker
çaxekî dirêj ji şah re leşkerî kiribû û
piraniya temenê xwe di nehtoriya wî
de derbas kiribû. Lê dema ew pîr
bû, serleşker rabû û bêtî ko tiştekî jî
bidiyê, ew ji leşkeriyê avêt. Leşker
firaxkên xwe li hev civandin, ew
kirine bexçikekê û çû da ser rîya
malê. Ji ber neheqîya lê hatibû kirin
gelekî mezin bû, ew pîr tore bûbû û
dilê wî pê dişewitî. Ji ber êşa dilê
xwe dest pê kir, sixêf kirine
serleşkerê xwe û di nav sixêfên xwe
de jî got:

- Laneta şeytên li serekê min be!
Hema dikaribû mûçeyekî piçûk yê
pîrbûnê bide min, ma wê çi
qewimîbana? Piştî van salên dirêj
hew ti kar jî ji min tê û êdî şerm e,
ez di vî emrî de rabim herim devê
xwe li ber xelkê xwehr bikim û
parsê bikim.

Ev got û ji xwe re ji ber kul û
derdên dilê xwe bi melûlî girî.
Gelek neçû ji nişka ve dît ko
mîrovek kete devê rîya wî de, silav
lê kir û got:

- Tu çima sixêfan dikî, camêr? Ma
çi bûye ko tu wilo dil bi kul î û
mîrûsê te kiriye?

- Ma ez çilo sixêfan nekim û ne
dil bi kul bim, piştî ko tiştên
hatine serê min. Dinya li ber

çavên min reş bûye û ez ji rojên li
pêşîya xwe ditirsim. Û çîroka xwe
tev ji mîrikê xerîb re got:

- De va hey serekên te dev ji te
berdane, çima tu nayî û ji min re kar
nakî?

- Ezê gelekî dilxweş bama ko karek
ji min hatibana, lê tu dibînî, ez kal
bûme û hew ti kar ji min tên.

- Karê min ti kar jê re nave, lê dive
ko tu bi ya min bikî û ez çi ji te re
bibêjim dive, ko tu ji gotina min
dernekevî.

- Ev çi kar e, ko ti kar jê re nave?

- Beroşeke min heye dive ko tu her
û her ardû bidî bin û tu her agir di
bin de gur bikî. Lê şertekî min heye.
Ew jî ev e, ko dive tu ti caran devê
beroşê nevekî û li hundurê wê
nenerî.

- Kî wê ardû bêne?

- Ardû wê li ber destê te be û wê
xwarina te jî hazir be, lê şertekî minî
din jî heye, ew jî ev e, ko ta tu di ber
karê min de bî, dive ko tu ne serê
xwe bişoyî û ne jî cilên xwe
biguherî! Û bi ser ve kir:

- Heke te qîma xwe anî û sê salan li
cem min kar kir, êdî ezê mûnetê
tevaya jiyana te bi te dim.

Leşker pirsî:

- Ma berî niha kesekî din li cem te
karkiriye?

- Na, û bi tenê dive haya te ji beroşê
hebe.

Dilê leşker hinekî xweş bû û da hê qenc behwer bike, pirsî:

- Ma bi rastî têra min xwarin li cem te heye? Ez navim ji nêza bimirim?

- Belê, netirse camêr, xwarin gelek e!

- Baş e min qebûl kir, lê piştê dive, ko tu min dîse vegeerînî vî cihî!

- Xwe li ser pirsê vegeerê jî netirsêne û pişt rast be, ko ezê te vegeerênime vî cihî bi xwe.

Dawî leşker qebûl kir û bêhna wî gelekî bi vî karê nû fereh bû. Lê hema ko wî navê xwe li ser pelika levkirinê nivîsand, wî dengê gurmênîkeke mezin kir. Bummm!!?



Û xwe di hundurê çiyayekî mezin û bilind de, li ber beroşeke li ber kelan diçû, dît. Ew beroş pir mezin bû û bi qelpaxeke mezin nixumandî bû.

Mîrov nikarîbû bibîne, ka çi tê de ye. Serekê nû jê re şirove kir, da çi dive bike û çi dive neke. Leşker soz da, ko wê daxwazên wî bi cih bike û wî bi rastî jî soza xwe bire serî.

Leşker ti caran qelpaxa beroşê nehilda û li hundurê wê nemeyzand û wî bê zexelî agir di bin de geş dikir. Wî ne rûyê xwe şîşt, ne neynûkên xwe birîn, ne rih û simbêlên xwe kurt kirin, ne pora xwe şikinî û di her sê salan de ne cilên xwe jî guhertin. Her sê sal derbasbûn bêyî ko ardû bikişênê û bêyî ko zanibe ka kî jê re têne. Dawî serekê wî hat û di rûyê wî de di hate xuyakirin ko ew bi karê leşker dilxweş e. Silav lê kir û pirsî:

- Kar çawa bû? Ma tiştê li te kêmket? Ma haya te bi dîlpakî ji beroşê hebû û te li hundurê wê temaşekir?

- Ti tişt li min kêmket û min ji binî jî li hundurê beroşê nemeyzand.

- Ez dizanim ko te soza xwe bire serî, win her çi leşker in, win hînbûyê rastîyê ne û di karê xwe de saxlem in. Ezê perê te dime te, lê tu çi dibêjî, ko tu hê sê salên din jî li cem min kar bikî?

Leşker xwe da paş û da zanîn, ko ev tenêbûn û ev karê yekrû pê giran in û kir ko bibêje: Na, ez nema li cem te kardikem. Lê serekê wî pê ve giha û got:

- Tu Bimêne! Ezê kiriya te bêhtir bikim, da tu karibî ji xwe re jinekê bêni û maleke weke dilê te dive ava

bikî. tu çiqasî zêr û zîv bixwazî, ezê bidime te, û heke tu bi min bişewirî, ka tê çi ji wan zêr û zîvan bikî, ezê nehêlim, ko ew ti caran li te kêmkir bikevin.

Leşker qîma xwe anî û levkirina xwe nû kirin.

Ew dîse vegera karê xwe û du salên girover derbasbûn wî bi dîlpakiya berê agir dibin beroşê de gur kir, lê di destpêka sala sisiyan de kete dilê wî de, ko li hundurê beroşê binere. Rabû qelpaxa wê hinekî hilda û li hundurê wê meyzand. Wî dît...kambaxa tiştên, ko wî dîtî...

Wî dît, ko beroş tijî mirov e, ew bi wan mişt bû. Wî hin ji wan mirovan nasdikirin, lê bêhtirên wan nasnedikirin. Yek ji wan mirovên di beroşê de serekê wî yê berê bû. Li gora kambaxên ko dîtibûn jî wî agir di bin de kêmkir. Kînen di dilê wî de, yên li dijî sereleşkerê wî, wilo kiribûn ko ew hê agir xweştir bike.

Di dawîya salê de serekê wî dîse hat û gotiyê:

- Ma te soza xwe bire serî?

- Erê, min bire serî, lêbelê careke bi tenê min li hundurê beroşê meyzand û min tiştên tê de dîtî, lê min agir ji berê diwartir kir.

Nexem e te çi di hundurê beroşê de dîtibe, lê ez ditirsim, ko te kêlîkinan agir di bin de vemirandibe. Û hê got:

- Tu navê sê salên din li cem min karbikî? Tu çi bixwazî, ezê bidime te?

- Na, na, ez divim dinyayê ji xwe re bibînim, ez ji biteniyê gelekî behnteng bûme.

- Hê min mirovên saxlem weke te, rast û baş nedîtine. Win leşker nîşana paqijî û rastiyê ne. Bi rastî ez hêvî dikim, ko tu karibî hê sê salên din di ber karê min de bimênî... ma tu çi dibêjî?

-Na, ez hew divim, ez pîrbûme û nema ez dikarim karê te bikim.

Serekê wî di ber xwe de got:

- Ez dibînim, ko nema kar dike, û divê ez soza xwe jê re pêkbênim! Ew ajote odekê, du kiwarên mezin tê de bûn. Ya pêşê tijî zêr bû, ya din jî tijî zîv bû. Wî gotiyê:

- De ta tu dikarî ji xwe re zêr û zîv hilêne...!

Piştî paşil û berîkên xwe dagirtin serekê wî bi şekekê ew bire cihê ko jê anîbû û dîse qewîtî lê kirin, ko qirêja xwe paqij neke, da zêr û zîvê wî kêmbûn. Leşker qîma xwe anî, serek wî bû û leşker bi riya xwe de çû.

Bi rê de geha bajarekî. Gelekî birçî bûbû, rabû berê xwe da mala pêşî, ya ko kete devê riya wî de. Li deriyê malê xist, xwediyên malê devê derî jê re vekirin û çavên wan pê ketin.

Riha wî ya dirêj û qirêj, gijola pora wî, neynûkên wî yên wek neperûşkên balindeyên kelaşan, çermê wî yê reş û cilên perpitî û gemar; ji wan wa bû, ko ew şeytan bi xwe ye, bi ser wan de girtiye.

Hemû ketine odekê û ji tirsan derî li xwe asê kirin. Rabû wî berê xwe da maleke din û yeke din, lê hemûyan wek mala pêşî berê xwe jê guhertin û berdane.

Reben ma bê çare, lê birçîbûnê dilovanî pê re nekir. Dawî ew çû mēhvanxanekê, wî goman dikir, ko

xwediyên mēhvanxanan mirovine kur in, hez ji peran dikan û bi peran daxwazên rêwiyan pêktênin û li çilobûn û çawabûna wan napirsin. Lê hema ko ew kete hundurê xwaringeha mēhvanxanê, mirovên li wir, her yekî bi aliyekî de bazda. Xwediyê mēhvanxanê bi xwe jî xwe di odekê de veşart û lîwana mezin ji leşker re hişt. Leşker çû li ber maseke mezin rûnişt û kulmek zêr ji berîka xwe derxist û danî ser masê. Hêdî hêdî zêr dihiymartin û dihişt ko çinge çinga wan di lîwanê de bela bibe. Wî dizanîbû, çawa ev deng wê xwediyê mēhvanxanê dî bike. Bi rastî jî girêza wî li ser wan zêran diherikî û dilê wî li ser wan diêşa. Derî hinekî li xwe vekir, da qenc behwer bike, ko ev zêr di nav lepên vî hovî de ne. Leşker pêjna wî kir û bê ko berê xwe bidiyê bakir:

- Were, bê tirs were! Ez jî weke te mirov im, guh nede qirêja min. Ez birçî me, xwarinekê ji min re bêne! Bihayê wê ezê vê koma zêran bidime te. Xwediyê mēhvanxanê bi ser de hat, lê bi zorê lingên xwe li dûv xwe dikişkişandin. Wî ji leşker pirsî:

- Tu ji kû ve tê û bi kû de diçî, nenaso?

- Ez leşkerekî kevn im, piştî ez kal bûme, ez ji leşkeriyê hatime der. Vêca ez divegerime welatê xwe.

- Malava, min berî te gelek leşkerên kevn dîtine, lê nayê bira min ko yekî weke te bi qirêj di nav wan de peyde bûbe. Ma di leşkeriyê de we wilo bi qirêj dihêlin?

- Na, çaxê ez leşker bûm, ez ne bi qirêj bûm. Na, ma gelo ji leşkeran

paqijtir kes heye? Lê van şeş salên dawî, min li cem mirovekî kar dikir, di nav van salan de wî nehişt, ko ez xwe bişom û cilên xwe biguherim.

- Wey bavo!... Ew çi mirovekî dîn bû, ko nedihîşt tu guh bidî xwe. Ew li kû bû û karê wî çi bû? Ma tu çi dibêjî vêca tu rabî, herî xwe bişoyî û cilê xwe biguherî, va te êdî dev ji karê wî mirovî berdaye?

- Ez nikarim bersiva te bidim, lê ez gelekî birçî me, ka xwarinekê bide min, ez ji nêza ketime.

Parîk nan anî, danî ber û bihayê wî nanî zêrên li ser masê tev maliştin û avêtine berîka xwe. Piştî leşker xwar, cihekî razanê jî xwest.

Xwediyê mēhvanxanê xwe neda ber daxwaza wî û got:

- Li min negre! Rêwî çav li te bikin, êdî ne li cem min dixwin û ne dirazin, karê min wê bê birîn. Ez nikarim te li cem xwe bicihkim.

Lê piştî xweş behwer kir, ko evê li ber wî ji tuxmê mirovan e, got:

- Baş e, lê bi şertê ko tu xwe bişoyî û cilên xwe biguherî?

Leşker qîma xwe neanî û got, ko serekê wî destûra wî nade. Xwediyê mēhvanxanê ma matmayî û pirsî:

- Wekî te dev ji karê wî berdaye, tu çima bi ya wî mirovî dikî?

Leşker mirûsê xwe ji pirsê wî kir û got:

- Ev tiştêkî nehînî ye, di nav min û serekê min de ye. Lê heke tu sûnda mezin ji min re bixwî ko tu hişkere nakî, ezê li te mukir werim.

Piştî ko wî soz da û xurcikek sûnd xwarin, leşker got:

- Ji ber ko ewê ko min li cem kar dikir, soz bi min re daye, ko heke ez

xwe neşom û kincên xwe neguherim, wê berikên min ticaran ji zêr û zîv vala nebin, ko ez çiqasî ji wan bibim jî. Serekê min ne kesekî weke herkesî ye. Wî ez bi awakî ecêb xistime hundurê çiyakî bilind û li wir ez şeş salan mam. Gelek hêvî û lavlav ji xwediyê mēhvanxanê kirin, da cihekî razanê jê re çêbike; û ew bi zêran tema kir. Xwediyê mēhvanxanê hinekî di xwe de pûniji, piştire got:

- Baş e, şertê serekê te giran e, û hêja ye ko tu xwe li ser bikî. Ezê odeke başqe ji te re bibînim. Her kes te li cem min bibîne nehesanî ye.

Dive pelikên te jî hebin, da ez zanibim, ko tu ne sêwelek î.

- Netirse lo! Ez leşkerekî kevn im û pelikên min hene.

- Çima naxwe tu navegerî welatê xwe û li wir najî?

- Rê dût û dirêj e. Her kes xwe ji min divede û direve. Hemwelatiyên min jî wê wilo bin. Tevlî van zêrên gelek jî ezê ji nêza bimrin. Zêr nayêne xwarin. Piştire dibe ko di nav van salên dût û dirêj li welatê xerîbiyê, êdî xwedî û hevalên min jî nemabin. Vêca her erda xwedê welatê min e.

Xwediyê mēhvanxanê xizan û deyndar bû û neçîra xwe di vî mirovê zêrweşên de dîtibû.

Kozikeke piçûk nêzikî serşokê dayê, leşker bi dîlxweşî ew bir û got:

- Ma gelo şahiyek mezintir ji vê bêhtir ji mirovekî kal re heye? Tiştê herî gerek ji kalan re ew e, ko hestûyên xwe di şevên zistanan yên sar û dirêj de germ bikin.

Leşker di kozika xwe de ma, xwediyê mêhvanxanê jî jê bêhijmar pere distandin. Wî deynên xwe hemû dan, xan û man ava kirin û bû zengîn û maldarê bajêr. Her kes dima matmayî, ka çaw xwediyê mêhvanxanê karibe di çaxekî wilo kin de hevqas semyanî bide hev. Xelkê dev ji xwediyê mêhvanxanê nediberda, jê dipirsîn, ka ev xêrê ji kû bi ser ve bûye. Wî çare ne dît û dawî serpêhatiya xwe bi leşker re ji wan re hişkere kir. Serpêhatî di cih de, weke ko agir bi pûş keve, bela bû. Ev serpêhatî berbi guhê qeralê welêt jî ket. Ew jî di bin deynan de mabû û temayî kete dilê wî de, rabû şiyande pey leşker, da ji wî rastiye zanibe.

Leşker ji fêhtiyar neçû, xwe şanî qerêl neda. Qeral dîse şiyande jê re, lê vê carê bi hêrz. Tirs ket dilê leşker de û ji xwe re digot:

- Ezê çawa herime dîwanê û xwe şanî qerêl bidim? Ez xwe paqij bikim, yan bi van kincên qirêj herim?

Çavên xwe girtin û weke yekî ji xwe re limêj bike dîse ji xwe re digot:

- Serekê min, tu li kû yî? Tu li kû yî?

Lê hema ko çavên xwe vekirin, dît ko serekê wî li ber rawestayê û dibêje:

- Here, û netirse! Bi gemara xwe ve here! Ti tiştê nebaş bi te nayê. Ez xweş dizanim çima qeral te dixwaze. Ew di bin deynan de maye û çavê xwe berdaye zêrên te. Ew behwer dike, ko karibe wan ji te bistêne û pê deynên li xwe bide. Here, û zêran jê re birijêne! Ew di

tengasiyeke mezin de ye. Lê dive tu vê ferzendê jidestê xwe neberdî. Ber bi titiştî newe, ta ko keçeke xwe nede te. Ez dizanim ko keça mezin û navê te nakin, lê dilê ya piçûk weke keleheke asê li ber hêza min hatiye girtin. Heye, ko te bike. Bere li bîra te be, ko her û her ezê bi te re bim, lê tikes wê min nebîne.

Serek ji ber çavên wî winda bû. Wî da pey nehtorvanên qerêl, û çû. Ew li ber destê qerêl rawesta û got:

- Ez im ew leşkerê kevn. We ez xwestim qeralê minî mezin, va ez li ber destê we me.

- Leşkero! Min gelek tişt li ser zêrên te yên diherikin bihîstine. Ma ev tiştên ji min re hatine gotin rast in? Û çima tu wilo qirêj î?

Belê ezbenî, ew rast in... Û jê re li ser serpêhatiya xwe ta bi derziyê ve kir.

Qeral got:

- Leşkero! Bibihîze! Zêrin ji min re divin... tu naxwazî alîkariya qeralê xwe bikî?

- Bi dilxweşî ezbenî, lê bi şertê ko win destê keçeke xwe bidine min? Qeral veciniqî û kûr li leşkerê kal û qirêj meyzand. Dawî got:

- Ez nizanim, ka gelo keçên min wê qîma xwe bi te bînin? Lê ezê ji wan bipirsim.

Bakire keça xweyî mezin, ew hat. Dema qeral jê pirsî, ma ew leşker nake, tirs pê ket û berî dilê wê biêşe bi xwe re geha bibêje:

- Ti kes vî cenawerî nake!

Qeral bakire keça xweyî navê û çî ji ya mezin pirsî bû, jê jî pirsî. Wê got:

- Xweştir e, ko win min bikujin, lê min nedine vî hovî.

Dawî keça piçûk hat û bi torevanî got:

- Ezê daxwaza qeralî pêk bênin, ezê wî bikim.

- Eger bi rastî tu dixwazî min bikî, dive tu vê diyariyê ji dest min bigirî û winda nekî?

Wî destmaleke neqîşandî ji berîka xwe derxist. Ew dirand û kire du parçe, yek da keçikê, yê din dîse vegerande berîka xwe. Serekê wî ew wilo hîn kiribû. Ji cem qeral vegera malê, dît ko serekê wî li benda wî ye û di bin lêvan de dibêşîşe, wî got:

- Te pir baş kir. De rabe xwe bişo û veşo, here baştir cil, hesp û galîskekê bikire û vê carê weke mîrekan dîse here cem qerêl!

Leşker li gor fermana serekê xwe kir. Êdî hew dît ko ji nişkê ve vegera weke xortekî tosinî ciwanî bê hempa. Di galîska zerîn de, ya ko xortekî çeleng dajot û hespên kehêl dikişandin, çû keheha qerêl. Serekê wî jî xwe kiribû berdesîkekî tosin û li rex rûniştû. Li ber dergehê kelehê peya bû û weke mîrekekî ji welatekî dûr, ko hatiye destê keçeke wî bixwaze, xwe pêşkêşî qerêl kir. Qeral bi hatina vî mêhvanê giranbiha gelekî dilşah bû û xweşhatineke mezin jê re çêkir, nexasim piştî, ko çav li xeml û zîna wî û hesp, galîsk û berdestikên wî kir. Qeral bakire keça xwe ya mezin, da mîr lê meyzêne. Keçik hat li ber destê bavê xwe rawesta. Dema çavên wê li mêhvanê bavê xwe yê delal ketin, ne bi dilekî bi sed dilî, dil ketiyê, lê mêhvan pêça xwe nedayê û berê xwe jê guhert. Keçika navê jî wek ya mezin destvala

vegera. Dawî keçika piçûk hat li ber bavê xwe, bi torevanî rawesta û got:

- Qeralê minî mezin! Nabe, ez nikarim mêhvanê we yê delal bikin! Ez bi dergistî me. Min soz daye dergistiyê xwe û ez soza xwe li erdê naxim!

Mîr li xwe nexweş anî û got:

- Ev kî ye û ji kû ye û çi mîrek e, evê win xwe li ser dîkin, ka çiqas zêr û gewher diyarî dane we?

- Ew ne mîr e û ji kû hetîye jî, ez nezanim? Lê min soza xwe daye, ez jê navegerim.

- Ezê we di nav zêr û gewheran de bihêlim, winê bi min re navmezin û cihbilind bijîn. Ka çi daye we, dive ez zanibin?

Keçikê ti çare nedît û got, ko leşkerê qirêj çi daye wê. Serî di ber de û bi fehtîke mezin parçê destmalkê derxist, danî ber mêhvanê bavê xwe. Her kesê li wir lal man, çaxê ko wî jî parçê din ji destmalkê derxist û demî ber parçê keçikê. Her dû parçe ji hev bûn. Mîr bi dengêkî bilind bakir:

- Ez im ew leşker, ez im zavayê te. Helbet dilê keçika piçûk ji şahiyê firî. Leşker têra qerêl zêr û zîv diyarî dan û çi kesê di kelehê de hebû wî jî para xwe stand û dilxweş bû. Ji keça qerêl ya mezin û navê pê ve. Kînê dinanên xwe di nav dilên wan re derbas dikir û dikola. Roja din keçika piçûk ji leşker re diguhestin, herdû xwîşkên wê xwe ji serê banê kelehê de avêtin û mirin. Dengê şeytên ji dûr ve dihat.

- Ha...ha...ha leşkero, te yek ji xwe re bir! Lê min dido pev re birim, ha...ha....ha!

JI HELAMETA STÊRAN DAKEVE



Mihemed Jûrî

Aşopa romaneke entîkeyî
Xwe di berbejna hişkeberan de dialand.
Werîsekî zivir
Li elendên zelal
Ji hevrikiya subê
Hêviyên di qurnetî re
hatin bend kirin...

Şifşên pîlayî,
Sergopkirina darên serkûrha,
Li benderiya sîtavka
Ya ji min, ya ji te
Ya ji agirê xewnan.
Pel carê sor dibûn
Carcaran jî kesk bixwe ve digirt
Ferhenga xewnên kujek,
Malxuliyanê digel hizrên betal dikir,
Pexşeka yekser bide.
Ji helameta stêra dakeve!
Rêportajên berperên reşgovara...!
Du çavên hilweryayî, li benda çi ne??
Di kêliyan re, bêhna qerquda serdikeve.
Ya sitar û bê lome be...!!!
Guhbel bi sê zêran dê hêne sizakirin.
Dê dayê:

Heyranokan bêje.

Ma Emo çî lê hatiye?
Bo carekê behsa misk û enberan nakî..??
Pêl çî dijwar in!!
Xişexîşa êzgeyî,
Guhên min berbi aloziyê birin.
Gêriyên te, pirasiyên pîtî, sivik kirine.
Esman xwedîke,
Xor salekê hatiye paş,
Ji nû ve...
Cêmik û kêvjal û şêr,
Kiç û kevan û neheng...



HUNERMENDEKÎ KURD

Behremê Hajo



Dr. Dieter Buter
Wergerandina ji inglîzî:
Dugir

- 1950 Li Rojavayê Kurdistanê
hatiye ser rûyê dinyayê
niha li bajarê Munster, li
Almanya diji
- 1970-1972 Akademya Hunerî li
Bexdayê xwendiyê
- 1978-1984 Xwendegeha Hunerî li
Munster xwendiyê

Cend pêşangeh

- 1983 Mûzexana bajarê
Bochum
- 1984 Navenda
Çanadê/Arnheim
- 1987 Galerya
Zander/Emsdetten
- 1990 Quadrat (Mûzexana
Josef Albers) Bottrop
- 1991 Xelata pêşî ya Mûzexana
Josef Albers wergitiye
- 1992 Mala Hunermendan/Graz
- 1993 Bazinê Cihanî, yê
Huner, Galerya
Kufa/London
- 1994 Galerya D'art
Damas/Sam



Hûnandina sîmayên

wêneyên Behrem, yên ko win
di vir de dibînin, bi pêşketina
wî, yasalên 1986 ta 1989an ve girêdayî
ye. Di wê demê de hunermend
endazeyên piçûk ji bona wêneyan
bikartanîn, yên herî mezin
100 x 80 cm
bûn, lê bi piranî ew 80 x
60 cm bûn.

Ji aliyekî ve di wan wêneyan de Behrem bi
motiv, babet, sîma û rengan dileyize û şahiya
hunermend di afirandina wêneyan de bi ezmûneyên
rengerengî, diyardikin; ji aliyekî din ve ew nîşanên
prosesa afirander in.

Mijarên ko Behrem dihişve wan gelekî
berferê in: jiyana hedînî, dîmenên xweristê, portrêt,
aliyên jiyana hawîrdorî wî, jinên tazî û rût û pir
caran gelek mirov bi komcivatî cihên xwe di
wêne de digirin.

Di wê demê de reng bi hêz ji bona babetê dihatê
bikaranîn. Reng ji bona piştgîriya babetê bû û
kêm caran nîrxekî din li derveyî wê armancê
dîstand. Reng di wan wêneyan de ji hingavtinên
nêrm ta yên beloq cih digirin, ko carinan xwe di

ser mercên
hevguncînê re çeng
dikin. Ev jî nîşanên
ceribandînan bi reng
û firçê re ne. Hemû
texlîtên rengan
bikaranîne, û
serdestiya hin
rengan bi tenê ji ber
motîvên taybetî ne û
ji bona bihêzkirina
rewîştên sîmbolî ne.

Hunermend
gelek mijar
û teknîk

bikaranîn, bêgoman
wî dixwest ko rîya
hunermendiya, ko di
dawîya dereng, ya
sedsala 18an de û di
destpêka vê sedsala
me de destpêkiribû,
bajo. Wêneyên wî
giranbihabûna yên
berî xwe werdigirin
ji ber awayê
pêkanîna motîvan,
ko mirovan bi
têkiliyên wan, yên
bi hev re pêşkêş
dike: mirovên li ber
keviya civatê dijîn,
kesên bêmal, xefk û
dawk, jin bi zarokan re, mêrên
awirşikestî- di wêneyan de ev babetên
serdest in. Reng weke alav, da
nûnertiya tişteki bike kêr û negiring
dihat, herweha xêzên, ko laş bi kêsim
dikirin, ne xwediyên giraniyeke bilind
bûn, ew tevî hin tîkilî û tarazûyên
taybetî dibûn, û hin bi hin bihayekî
sîmbolî distandin. Di heman wext de
valayiyê di designa hunerî de cihekî
giringtir distand, ta wê radeya ko
endazeyên piçûk, yên wêneyan, bergeh
ji bona bikaranîna valayiyê weke alavê



derbirînê dida. Xêzên rû û laş tenik
dibûn, reng zelal dibûn û di nav wan re
dihate dîtin. Bi vê yekê bi dest wî ve
dihat, da bi şeweyan bileyize, bizavê
biafirîne û bi awakî fereh xisletên
psîkolojî bide wêneyan û da hesteyên
xemgîniyê- yan jî hevbeşiya qederê
diyar bikin. Di heman demê de derkete
holê, ko di girêdana motîvên ji welatê
bav û kalên xwe, bi motîvên ji welatê
xwe yê nû ve, bi mijarên wêneyê xwe
ve Behrem serkeftî bû. Wî bingehên
sîmbolizma hunerî ya çanda pirtexlît


peyde dikir û vê dihişt, ko ew bikaribe koka ezmûneyên mirovatî, yê bi me hemûyan re hene, derbibire.

Guhertina bikaranîna rengan, hêwirandin û nijinandin valayiyê weke alavê pevguncînê, û kêmkirina hijmara motifan- motifên mayî nûnertiya kesan û têkiliyên wan bi hev re dikirin; di sala 1990î de berdewam kir. Behrem dest bi bikaranîna endazeyên mezin kir, pîvana wêneyan bi gelemperî digeha 150 x 130 cm.

Bi vê wî êdî dikarib û mirovan bi gewdên wan, yê nêzikî rastiye nîgar bike. Ew di rewşa ezmûneyên rojane de xwiya dikin, ew di atmosfêra pevrebûnê de ne. Têkiliyên kesan dûrbûnekê nîşan dikin, tevî ko ew di wêne de gelekî nêzikî hev in jî. Levbanîn û lev mukuriya kesan di raxistina wan de, ya li ser cawê tabloyê di rastiya xwe de nekokkirina

wan bi hev re, nîşan dikin. Takekes awirên xwe ji kesên ko mijara wêne ne, diguherin. Çavên wan kesan bel in, weke ko li bersiveke, ko ew nikarin bibînin û bi xwe nikarin bidin, digerin. Çavên wan ti canan li hev nakevin, lê di paralelizma nemayê de hevûdu winda dikin.

Di vê xuleyê de, di bareyên levbanînê de, wêneyên Behrem guh nadine hebûna bi hev re. Li şûna wê ew dûrbûna di nav mirovan de diyar dikin, dûrbûna wan ji hev, ji dûrbûna seresere,



ya ko tê xwiyakirin dibuhûre, ew xwe di sîmbolizmeke herî bilind de, ya designa wêneyî de, ko babetê wê jîyan û mirin e, dibîne.

Behrem hê gelekî bi neteweyê xwe yê Kurd ve girêdayî ye. Ev yek wî diajo, da ko ew sûdê ji alavên xwe yên hunerî bistêne û rebenî, perçiqandin, azarî û zordestiya mirovan li dijî mirovan, bi taybetî li Rojhilata Nêzîk, destnîşan bike. Wî rêzeke dirêj ji wêneyan afirand, ko di wan de babetê azariya mirovan û bêçareyî li hemberî

çavsoyîyê, bi pêş de dixist. Di wan de çav in, ko girêdana di nav takekesan de nîşan dîkin û bala temaşevanan dikişîne bi ser motivên xwe de. Rû ji ber êşê dêforme bûne. Wêne bi îşkenca bêsînor dagirtî ne. Devê mirovan ji ber êş û kul û derd û xeman ta dawî vekirî ne. Ew dibîne sîmbolên derbirîna hejariya ko nayê pesindan. Teknîka wî ya risimandinê derfete didiyê, da ko ew li tiştên berê qewimîne, vegere û li ser wan wênene nû biafirîne. Ew li ser wêneyên xwe yên kevin, yên ko motivên wan li ber dilê wî sarbûne, careke din dirisimîne, lê hê hinek çik di wan de heye, da bibîne

keresteyên wêneyên nû û designên nû. Niha Behrem dest bi risimandina xwerista welatê bav û kalên xwe kiriye. Xanî, av, gund û dar babetên wêneyên wî yên dawî ne. Di wan de carnan lawîrek riya xwe windike, yan jî keştiyek ne li cihê xwe ye, li bejê ye. Dema mirov li van wêneyan dinere, tê dîtîn, ko Behrem li navgînine stîlî digere û ev jî bi kêrî wî tê. Ew xwe durrî xwerista, ko ji ber realizmê dimire, dike û ji aliyekî din ve jî ew rê didiyê, da ko



hesteyên xwe bi awayekî hunerî li bara welatê xwe, derbibire.

Sê mijar:

- pirsê têkiliyên di nav mirovan de, ya di demeke xerîb de
- perîşaniya mirovan li herêmeke ko ti caran şer lê nayê rawestandin
- zilm, cor, stem û çavsoyîya bêşînor

bertekiya hunermend in li beramberî kultûra wê herêmê. Ev jî dibîne bîngeh, da ko mirov karibe birame, ka ewê hevsarê hunermendiya xwe bi kû ve bikişîne. Lê di vê dawiyê de hin elementên nû di wêneyan de peyde dibin, dibe ko ev jî nîşan bin ji guhertinan re.



LÎSTEYA PEYVÊN JI PÊNÛSA MÎR CELADET BEDIRXAN

Amadekar: Zagrosê Hajo

Ji destpêkê ve me ji xwe re kiribû armanc ko kovara me li gor alfabe, vekît û rêzimana Mîr Celadet Bedirxan derkeve. Pêkanîna vê armancê, ji ber sedemên diyar, ne bêalozî ye. Di behweriya me de her peyva kurdî, bi çi zaravî were gotin, ew peyveke rast e. Jixwe pirs ne pirs, ka gelo kîjan peyv rast e yan şaş e, lê pirs ya yekîtiya nivîsandina vekîta peyva kurdî ye. Weke nimûne peyva *behar*, *bihar* û *buhar* peyveke kurdî ya rast û resen e, lê li gor zaravên kurdî bi sê şeweyan tê bilêvkirin. Ji bona yekîtiya nivîsandina vekîta peyvê, dive şeweyek cihê xwe bigire û bibe standard. Di vir de alozî derdikevin: Em kîjan peyvê di nivîsandinê de bikar bînin? Em çara vê pirsê bi vî rengî dibînin: Gerek e, em tev xwe li dora zanayekî kurd bidine hev û peyvên ko wî bikaranîne ji xwe re bikine nimûne û li gor wî binivîsin. Li vir berî herkesî Mîr Celadet Bedirxan tê ber çavê mirov. Ew zimanzanekî mezin bû, wî bi zanebûn, bi awayekî nivîsand, da ko ji aliyê piraniya kurdan ve were pejirandin û bi vê wî hîmê zimanê nivîskî yê yekgirtî danî. Nîşana bîrewerî, zanebûn û toleransa wî ev e, ko wî ne zaravê cihê xwe Cizîra Botan bikar anî.



Me nêzîkî 2200 peyvên ko Mîr Celadet Bedirxan di pirtûka Bingehên Gramera Kurdancî de nivîsandine, danehev û em wan weke listeya peyvan di vê jimara Dugirê de çap dikin. Eger ji dest me hat, emê hemû peyvên, ko wî bikar anîne, çap bikin. Em hêvî dikin, ko hemû nivîskar vekîta van peyvan di nivîsên xwe de bikarbînin.

A	balafirgeh	belek	bide
adefî	balgih	belg	bidim
Agirî	ban	bêm	bidin
ala	baneşan	bên	biezimînin
alîkî	baneşanan	bendek	biferq
aliyê	baneşaniyê	bendekê	bifroşe
aliyî	banî	bendik	bigihin
an	baran	bêne	bigota
ango	barê	bênefsî	biguhêşîne
anî	bastûra	ber	bihata
anîn	bastûrê	beran	biheve
anîne	bastûrên	beranan	bihevebûna
arîkariya	baş	beranên	bihevketî
aş	bav	berbihevîn	bihin
aşî	bavê	berda	bihîst
ava	bavekî	berê	bihîstiyê
avan	bayê	berevajî	bihnok
avdar	be	berf	bihnokê
avê	bê	berî	bihurîn
avên	bêbextiyê	beriya	bijartin
avî	bêdar	berpêşkî	bijmêrîne
avinê	bedena	bersivên	bike
avis	bedeneke	bervajî	bikeve
awakî	Bêdiro	berwar	bikevin
awan	bêferq	bes	bikim
awartan	bêgavî	besî	bikin
awarte	bêgaviyên	bête	bikira
awarteyên	bêhna	bêtir	bikirim
awarteyî	behvan	bêxe	bilêvkirin
awarteyin	bêî	bêxin	bilêvkirina
awayê	bêje	beyabanên	bilêvkinê
awayên	bêjê	beyanamak	bilind
awayî	bêjeke	beyanamêk	bilindbûnê
awirê	bêjekê	beyanameyek	bilindcihên
awirên	bêjeya	beza	bilintir
awirî	bêjeyan	bezabûna	bimînin
ax	bêjeyê	bezatir	bimrim
axaftin	bêjeyeke	bezê	bin
axaftinê	bêjeyekê	bi	bîn
	bêjeyên	bibe	binahî
	bêjeyin	bibêje	bînahiya
	bêjeyine	bibêjin	binav
B	bejî	bibin	binavkirî
bajar	bêkesî	bibînim	bîne
bajarî	Bêlan	bibînin	bingehên
bajêr	belayê	biçiwam	bingehî
balafir	belê	biçiwayî	bingehîn

Bîngolan	biwayî	cihên	çendekê
bînim	biyanî	cihgirtiyê	çêtir
binimîn	biyaniyan	cîranan	çevandin
binimîne	bizandin	cîranê	çi
bînin	bizeliqe	cisin	çî
binve	bizin	cisnê	çikandin
bîr	bizinan	cisnên	çil
biran	bizinê	cisnî	çilî
birayê	bizinekê	ciyok	çiqas
birayên	bizinî	Cizerî	çirakê
birazê	bizinine	co	çirayê
birazî	bo	cokê	çirayekê
birca	borî	comerdî	çire
Birca Belek	borîn	coyekê	çirê
birçî	bot		çiya
birê	Botan	Ç	çiyakî
bîrê	Botanê	çar	çiyar
birekî	boz	çaran	çiyayan
birên	bû	çardeh	çiyayê
bireser	bûm	çare	çiyayên
bireseran	bûn	çarim	çiyayî
bireserê	bûne	çarkîte	çiyê
bireserek	bûnê	çaryek	çû
bireserekî	bûra	çavan	çûm
bireserên	bûye	çavbelek	çûme
bireserî	bûyî	çavên	çûn
bireserin		çavreş	çûnkî
birêva	C	çax	çûnkirin
birewîn	can	çêdibe	çûyî
birewserên	Cangîr	çek	D
birî	caran	çêkirin	da
birîn	carê	çêkirina	daçek
birsî	careke	çêkirine	daçekan
bisekine	carina	çel	daçekek
bisenîfinin	ceh	çêl	daçekên
biserketina	celeb	çêlek	dagirtî
biservebûna	cem	çêleka	dagirtin
biserveçûna	Cemşîd	çêlekan	daket
biserveketina	cenawir	çêlekê	dan
biserxwe	cida	çêlekî	dane
bîst	cih	çêlî	danîn
bîstan	cihan	çem	danîna
bîstekê	cihderka	çeman	dar
bitewîne	cihderkê	çend	dara
bişkênîne	cihderkên	çendan	daran
biwa	cihê	çendek	
biwam			

darê	dengî	dibêje	dike
darî	der	dibêjin	dikete
datînin	derbas	dibin	diketin
dawêşîne	derbekê	dibîne	dikeve
dawî	derê	dibînî	dikevin
dawiya	dereceyên	dibînim	dikin
dawiyê	derên	dibînin	dikirin
daxêve	dereng	dibire	dikuje
daxêvin	derêxistin	dibîrî	dil
daye	dergevanê	dibistanê	dilovan
dayîn	Dêrgul	dibûn	diltenik
de	derî	diçe	dilşikestî
dê	derincê	diçêrînim	dimîne
deh	deriyê	diçim	dimînin
dehan	deriyên	diçin	din
dehbe	deriyî	diçûn	dinimîne
dehkerên	derket	didan	dinimînin
dehşik	derketin	dide	dinivîsîne
dek	derketiya	didim	dinivîsînin
dêl	derkevin	didin	dinya
delal	derman	dido	dinyayê
delala	derpêş	didowan	dipirsim
dêlegur	dertên	didowên	dipirsin
dema	derve	diecibînî	diran
den	derzî	diedilîne	dirêj
deng	dest	diedilînin	dirêjbûna
dengbêj	destê	dieyinên	dirêjtir
dengbêjî	destmala	digehe	dirhav
dengdar	destmalê	digehin	dîsan
dengdara	destmaleke	digehîne	disekine
dengdaran	destmalên	digel	disekinin
dengdarê	destpêka	digere	distînim
dengdarên	destvala	digerî	distînin
dengdarine	deştê	digirin	dît
dengdayiya	dev	digot	ditewe
dengdayiyê	devê	digote	ditewin
dengdêr	devera	digotin	ditewîne
dengdêra	deverê	diguhe	ditewînin
dengdêran	devkî	diguhe	diş
dengdêreke	dewlemendî	diguhe	dişkê
dengdêrekê	dewlementir	dihêlim	diştexile
dengdêrên	deyê	dihî	dîtî
dengdêrin	di	dijminan	dîtim
dengê	dî	dîk	dîtin
dengek	dibarin	dikare	dîtine
dengekî	dibe	dikarim	dîtine
dengên	dibêj	dikarin	dîtînin

divêt	dûpaşê	ewçend	fikirek
diviya	dûr	ewê	fikireke
diwan	dwanzdeh	ewên	fikirekê
dîwarê		ewî	fîla
dîwarên	E	ez	filan
diwesifînin	Efrîqayê	ezbenî	filanan
diwesifînin	Efrîqê	ezê	filanê
diwim	Efrîqe	ezman	filankes
diwiya	eger	ezmandev	fîlê
dixebitînin	Ehmedê	ezmanî	fireh
dixesisînin	Ehmedên	ezmên	firehtir
dixin	ejnû	ezo	fîrî
dixuye	ek	Ê	fîrot
dixuyin	ekê	êdî	Frensayê
dixwar	ekî	êk	Frense
dixwaze	ekêk	êkdin	Frensê
dixwazî	em	êkdû	Frensizî
dixwazim	emê	êkê	
dixwend	Emêrika	êkûdin	G
dixwest	Emêrikayê	Êmê	ga
dixwî	Emêrikê	ên	garan
dixwîne	enî	êş	gava
dixwînin	enû	êşandim	gayê
Diyarbekrê	eqil	êxistin	gelejmar
diyê	eqilê	êzing	gelejmara
diz	eqilmend		gelejmare
dizane	erd	F	gelejmarê
dizandin	erdê	Farqînê	gelejmarî
dizandî	esil	fedkire	gelejmarîya
dizê	esilê	fedkirî	gelejmarîyê
dizekî	esilên	fedkirim	gelek
dizî	eskerî	fedkirin	gelekî
dom	esmer	fêkî	gelemper
doma	esmera	Felemêz	gelemperî
domê	eşîrê	fenekirî	gelêr
doşe	eşîrên	feqehên	gelo
dotmam	eşkeran	Ferat	Genco
dotmama	eşkere	ferq	gerek
dotmamê	ev	ferqa	gerguhêz
dotmamên	evan	Ferzende	gewr
dran	evê	Ferzo	gî
du	evên	fikir	giha
dubare	evî	fikira	gihane
dukîte	evor	fikirê	gihanek
dumilî	ew		gihaneka
dunik	ewan		gihanekê
dûpaş			

gihanekekê	guhêrbariyê	hejdeh	hespinin
gir	guhêrî	hejmara	hest
girav	guhêrîna	hejmaran	hestek
girdek	guhtêrbar	hejmarê	heta
girdekek	gul	hejmareke	hetanî
girdekekê	gulan	hejmarên	heşîn
girêbide	gulanê	hejmartin	heşt
girêdan	gulat	heke	heştan
girêdayî	gulok	hêla	heştê
girêdide	guman	helesor	hev
girêdidin	gund	hêmanê	hêv
girêkî	gundê	hêmanên	heval
girt	gundekî	hemî	hevaltiya
girtî	gura	hemîyan	hevdeh
girtin	gurê	hene	hevdi
girtine	Gurgîn	her	hevdu
giş	Guzvan	herçend	hevdûbêja
gol		herçî	hevedidanî
gola		herdiwan	hevenav
golê		herdu	Hevêrkan
goleke		here	hevgihanka
gopalê		Herekol	Hevind
gora		hergav	hevokên
goreyî		herim	hevqas
gorî		herin	hevraz
got		herkes	hevûdin
gote		herkesî	hewce
goşt		hertişt	hewşê
goştê		hertiştî	hey
goştî		herwekî	heyber
goştinî		heryek	heyberê
gotin		heryekê	heybereke
gotina		hesêb	heyberên
gotinê		hesibandin	heyberine
gotiye		hesibandine	heye
gramêr		hesp	heywan
gramêra		hêsp	heywanan
gramêrê		hespan	heywanê
guh		hespê	heywanekî
guharta		hespek	heywanên
guhartin		hespekî	heywanî
guhartinna		hespên	hezar
guher		hespî	hezaran
guhêrbar		hespin	hezarekî
guhêrbarî		hespina	hezarî
guhêrbariya		hespine	Hezarom
		hespinen	Hezro

H

ha
Haco
Hacoyê
halê
halên
halî
hat
hata
hate
hatî
hatim
hatin
hatine
hatingirtina
hatiye
Hawar
hawî
hazir
hazirbûna
hebû
hebûn
heçî
heft
heftan
heftê
hêj
hêja

hikim	insaf	kanîke	kesan
hikimê	isûl	kanîne	kesê
hılanîn	isûlê	kaniya	kesekî
hildan	işareta	kaniyên	kesên
hilfîrandin	işaretan	kar	kesî
hilgirt	işaret	kare	kesîn
hilînin	işaretekê	karê	kesine
hilkîşiya	işaretkirinê	karekî	kesk
hiltînin	işarkî	karî	keskesor
hin		karim	ket
hinan	Î	karin	kete
hinarê	îro	kariyê	ketim
hindê	îsal	kaş	ketina
hindik		kavir	ketine
Hindistan		kaxez	ketiya
hinek	J	kaxezê	ketiye
hinekan	jan	ke	kevan
hinekên	jê	kê	kevanek
hinên	jêk	keç	kevanekan
hingê	jêr	keça	kevanî
hirça	jêrîn	keçê	kevin
hirçê	jev	keçek	kevir
hire	jew	keçên	kêvir
his	ji	keçik	kevirî
histiye	jî	keçikan	kevnar
hiş	jîn	keçikekê	kevnare
hişk	jina	keçikî	kevroşka
hişt	jinên	kêfa	kevroşkê
ho	jinik	kelehê	kew
hogiriyek	jinika	kêm	kewa
hoker	jinikê	kêmahiyek	kewê
hokeran	jinine	kêmbûna	kewên
holê	jmarîn	kemper	kezeba
hon	jmarînav	kemperandin	kî
hotin	jmarînav	kemperiya	kiçik
hundir	jmarînavan	kêmxew	kifş
hûr	jmarînavê	kêne	kîj
hûrek	jmarînavê	kengê	kîjan
hûrekan	jmarînavê	ker	kîjanan
	jor	kêr	kîjanê
	jorîn	kera	kîjanî
I		kerê	kîjik
ibret		kerekî	kîjikan
im	K	kerem	kîjikê
imza	kalo	Kerevon	kîjikî
in	kanî	kerî	kir
inkar		kes	kirar

kirarê	kurdmanç	li	mehcetê
kirarekî	kurdmançan	lihevxişt	mehder
kirarên	kurdmançên	lihevxiştî	mehîn
kirêr	kurdmançî	lihevxiştina	mehîna
kirî	kurê	lisermasan	mehînan
kirin	kurek	liwîpirsî	mehîne
kirîn	kurekî	lo	mehînê
kirina	kurên		mehînek
kirine	kurik		mehîneke
kirîne	kurin		mehînekê
kît	kurm		mehînên
kîta	kurmançên		mehînî
kîtan	kurmançî		mehînin
kîtê	kursî		mehînina
kitêb	kursîk		mehînine
kitêba	kursiyan		mehû
kitêbên	kursiyek		mêjer
kîtek	kurt		mêjerê
kîtekê	kurtebir		mêjerî
kîtên	kurtî		mêkew
ko	kurtir		melayên
koçka	kurtiyê		mêr
kom	kutebir		mêranî
komek	kuşt		Mêrdînê
komeka	kuştine		mêrekî
komekan			mêrên
komekê			mêrik
komekekê			mesela
komekên			met
komelîn			meta
komika			mêş
kû			mêvandar
kuç			mexsed
kûderê			mexwe
kul			meyildariya
kulî			meywe
kum			mêze
kumê			mezin
kumên			mezinbûn
kumêt			mifta
kumî			mih
kur			mihê
kûr			mihirvan
kurd			mijarekê
kurdî			mijûl
Kurdistan			milê
Kurdistanê			miletê

M

ma	mada	madeyên	mak	maker	makerê	mal	malê	malikê	mamê	mana	manadar	manakê	manayên	mane	manê	mang	mange	masa	masak	mase	masê	masekê	maseya	maseyan	maseyek	maseyekê	mayîn	me	mê	mebêje	meczî	medhelok	medhelokê	meê	meh	meha
----	------	---------	-----	-------	--------	-----	------	--------	------	------	---------	--------	---------	------	------	------	-------	------	-------	------	------	--------	--------	---------	---------	----------	-------	----	----	--------	-------	----------	-----------	-----	-----	------

mîlyon	nakevin	nema	nîvekî
min	nakim	nemaze	nîvî
mîna	nakin	nêr	nîvîsandin
miqayese	namîne	nêrê	nîvîsandina
miqayesê	namînin	nêreker	nîvîsandinê
mîr	nan	nêrên	nîvîskî
mîran	naqede	nerênî	nîviz
mîrekî	nas	nerêrast	nîvro
mirina	nav	nêrî	nîvrorohelatê
mirine	navbera	nerihber	nîvyek
mirîşk	navbeyna	nermijandin	nizanim
mirov	navdarekê	nêtar	nizanim
mirovan	navdêr	netewîne	nîzik
mirovê	navdêra	newala	nizim
mirovekî	navdêran	newalên	nizimbûnê
mirovên	navdêrê	nexweşiya	nîzing
mirovî	navdêrek	neyin	nîzingbûna
mirovine	navdêreke	neyit	nîzingbûna
mîsal	navdêrekê	neynikê	nîzingî
mîsala	navdêrên	niho	no
mîsalan	navdêrine	nik	not
mîsalê	navdêrke	nikare	notî
misalên	navê	nikarî	nozdeh
mîsalên	navekî	nikarin	nû
mitik	navên	nimandin	nûza
mixdar	navro	nîmêj	
mixdaran	naxin	nîmînendeyê	
mixdarê	naye	nîne	O
mîzgînî	nayem	nînin	ortê
mozê	nayete	niqte	ox
mûsîqayî	nayîne	niqtebang	
	nayînin	niqtebihnok	P
	ne	niqtecot	pak
N	nebin	niqtecotek	panzdeh
nabe	nebinavkirî	niqtepirs	par
nabêje	nebûne	niqtesanî	Parîsê
nabin	nêçîr	niqteşaniyê	parkît
nabînim	nêçîrê	niqteyek	parkîta
nade	nedagirtî	nîşan	parkîtek
nadin	nedît	nîşandek	parkîten
nadiyê	neêxistina	nîşandekan	paşê
nagehin	negerguhêz	nîşandekên	paşî
naguhêre	negot	nîşank	paşîn
naguhêrin	neguhêrbar	nîv	paşiya
naguhêrînin	neh	nîvan	pê
nake	nehan	nîvê	pêdikin
nakeve	nehatiye	nîvekê	

pehîn	peyhevketina	pronavine	R
pehnav	peyî		ra
pehnava	peyman		rabe
pêjneke	pez	Q	raberî
pêk	pezê	qala	rabû
pêkanîna	peznan	qasî	rabûn
pêkhatina	piçûk	qedandîye	radibe
pêkî	piling	qeder	radibin
pêlên	pir	qederê	rake
pênc	piraniyeke	qederekî	rakiriye
pêncan	pirê	qedir	rast
pêncên	pirîcar	qedirê	rastaxaftin
pencere	pirkîte	qedirgiran	rastek
pêncî	pirs	qehir	rasteka
pêncîkîte	pirsan	qehiran	rastî
pêr	pirsî	qelem	rastiyê
perçak	pirsiyara	qelemên	rastnivîsandina
perçe	pirsiyarê	qels	raveka
perçê	pirsiyariyê	qenc	ravekê
perçekî	pirsiyarkî	qencî	ravekirin
perçeyek	pirsyarkî	qenctir	raver
perdak	pirtiqal	qermiçandin	rawes
perdan	pisinga	qersene	rawesê
perdê	pisingê	qesir	rayekê
perdeyan	pismam	qesira	rayekî
perdeyê	pismamê	Qeşem	rayî
perdeyek	pismamên	Qeşemê	razî
pere	pişt	qewimî	re
pereyî	piştî	qey	rê
peritî	piştre	qeyda	reh
pesnan	pîvan	qeyde	rehma
pêş	pîvene	qeydê	rêke
pêşdetir	piyekî	qeydeyên	rêlê
pêşî	piyî	qifil	rêmanên
pêşîn	post	qifilê	remil
pêşiya	poz	qirika	remildar
pêşiyê	pozberan	qiset	remilê
pev	pratîkê	qisetê	reng
pêve	pronav	qub	rengdêr
pêveberê	pronava	qul	rengdêra
pêvebûna	pronavan	qunders	rengdêran
pey	pronavê	qurç	rengdêrê
peyakî	pronavek	qure	rengdêrek
peyan	pronaveke	qurm	rengdêreke
peyar	pronavekê	qurtik	rengdêrekê
peyayine	pronavên		rengdêrên
peyda	pronavî		

rengdêrîn	sedî	Soro	şikênand
rengdêrine	segmanên	Sortir	şikestî
rengên	seh	spehî	şikil
resim	sekinandin	spehîtir	şikilan
resiman	sêkîte	spehîtiyê	şikilê
reş	selef	spî	şikilekî
reşandina	selete	spîtahî	şikilên
Rewan	senifandin	stand	şikilî
Rewanê	ser	sto	şikiline
rêwî	serê	stran	şikir
Rewşen	serên	strand	şikira
rexma	serenav	stranê	şikirdar
rêza	serenavan	stûna	şîpane
rêzê	serenavekî	stûnên	şiştin
rêzîn	sererast	stûr	şûna
rih	Serhedan	stûrî	şûnê
rihver	serî	stûrtir	şûnên
rikin	sernav	Sûriyayê	
rikinên	serşok	Sûriye	
rintir	sêv	Sûriyê	
rîtil	sêvê		T
rîtilan	sêveke		ta
rîtilî	seyekî	Ş	tadîl
riwî	seyim	şagirt	tam
riya	sêzdeh	şagirtê	tarîxî
riyan	sibe	şaneke	tariya
roavêyê	sibê	şaneka	tavêje
rojnamevan	sih	şanî	tayîn
rû	sihî	şanzdeh	te
rûnistî	sihir	şanzdehan	tê
rûpel	sihirbaz	şaristan	teba
rûpelê	sihirê	şeh	tebayine
rût	Sînemê	şehiristan	têk
rûyî	Sînemxan	şêr	têm
	sîng	şêrê	temam
S	Sîpan	şergeh	temamî
sabit	sisê	şêrîn	Temo
sade	Sîsin	şertê	tên
Sado	sisuyan	Şêrwan	tena
sar	siviktir	şeş	tenê
sax	siwar	şeşan	têne
saz	siwarê	şeşderb	teng
sê	sîxura	şeşderba	tenik
sêbare	sîxurê	şêşt	têr
sebebekê	sor	şêştî	terikandina
sed	Soran	şevê	tersê
	sorboz	şewat	têt
			tête

xurdek	ye	zêrekî
xurîn	yê	zêrî
xurt	yek	zilamek
Xurşîd	yekane	ziman
xurtir	yekcar	zimanê
xuya	yeke	zimanekî
xwar	yekê	zimanî
xwarin	yekejmar	zimên
xwe	yekejmara	Zîn
xwedêo	yekejmarê	Zînê
xwedîn	yekejmarî	zirav
xwedîyan	yekejmariyê	zîwan
xwediyê	yekî	zozan
xwediyên	yekînekên	zozanan
xweh	yekîte	Zozanên
xwemalîn	yeko	zravî
xwemaliyê	yên	
xwend	yezdanê	
xwenda		
xwendin		
xwendinê		
xwerû		
xwesar		
xwesarî		
xweseriya		
xwesiwê		
xwest		
xwesû		
xwesûkê		
xwesûyê		
xwesûyekê		
xweş		
xweşcivat		
xweşdengiyê		
xweştir		
xwîn		
xwînê		
xwirdek		
xwserî		

Y

ya	zanîn
yan	zarê
yanî	zarekî
yanzdeh	zarok
yara	zarokan
	zarokek
	zarokekî
	zarono
	zarowên
	zayend
	zayenda
	zayendan
	zayendê
	zayendên
	zayendî
	zebeş
	zebeşekî
	zebeşî
	zêde
	zehf
	zeliqîne
	zemanê
	zemanên
	zer
	zêr
	zêran

Z

Kovareke nû

kovara hunerî, çandî û siyasî ya kurdên anatoliya navîn

bîrnebûn

Bihar / Havîn 1997

Aksaray Kürtleri

Miçe Üsê

Tevn/Teşî

Orta Anadolu

Kürtlerinde halı sanatı

Muzaffer Özgür

Belge

Sefki Aşiretinin

iskan öyküsü

Nuh Ateş

Orta Anadolu

Alevlerinde,

Kürtçe Ayet ve Beyitler

Mehmet Bayrak

Edetên Zewac / Dawatê

Meçoyê Darê

Yarenî / Henek

Mem û Hemî

Horasan Kürtleri

Gabêr Çiyarî

2



Ji aliyê kurdên Anatoliya Navîn kovara Bîrnebûnê wek kovara hunerî, çandî û lêkolînî derdikeve. Hejmara 2'an, bi mijarên balkêş hatiye dagirtin. Ji navnîşanên jêrîn hûn dikarin Bîrnebûnê peyda bikin.

Navnîşan:

Li Almanyayê

Karl str. 2, 35576 WZ

Deutschland

Telefaks: +49 6441-52 615

Li Swêdê

Apec

Box 3318, 163 03 Spånga-Sverige

Telefaks: + 46 8 761 24 90



Ji navnîşana DUGIRê bixwazin.

Lista weşanên Apecê

Art.nr. TITEL (Navên kitêban)

- ☐ (3128) Ken û Girîn, A. Tigrîs û R. Motkî, kurmançî
- ☐ (3129) Iqde Durfam, Şêx Eskerî, kurmançî
- ☐ (3130) Dal (helbest), Şêrko Bêkes, soranî, bi tipên latîni
- ☐ (3131) Navên Kurdî, A. Tigrîs, kurmançî
- ☐ (3132) O Bir Dağ Çiçeği, Xorto, bi tirkî
- ☐ (3133) Siverek 'te Bir Gece Vakti, Xorto, bi tirkî
- ☐ (3134) Herdûbat, Mele Zahîde Diyarbekirî, kurmançî
- ☐ (3135) Çend Rûpel Ji Dîroka... K. M. Ahmed, kurmançî
- ☐ (3136) Kurdistan' da Kapital... S.A. A. Nas, bi tirkî
- ☐ (3137) Mehmed Arîf Cizîrî..., S. Abdulhekîm, kurmançî
- ☐ (3138) Gulbijêrek Ji Helbestên Şêrko Bêkes, kurmançî
- ☐ (3139) Nîşan û Dawet, A. Tigrîs, kurmançî
- ☐ (3140) Jana Gel, İbrahim Ahmed, kurmançî
- ☐ (3141) Roj bi Roj Şerê..., Tigrîs, Batun, Xortoê kurmançî
- ☐ (3142) Kalemimden Sayfalar, N. Büyükkaya,
- ☐ (3143) Bingehên giştîyên komelnasî, H. Xalikî, soranî
- ☐ (3144) Mîtolojîyên Mezopotamya, E. Petîşka, kurmançî
- ☐ (3145) Rondikên Cavên ti..., F. İremet, dimilî-kurmançî
- ☐ (3146) Den kosmiska kârleken, P. Rustemê, bi erebî
- ☐ (3147) Om Kurder PM, N. Aldurê, bi siwêdî
- ☐ (3148) Kurdistan we el-xeyar..., C. Mayî, bi erebî
- ☐ (3149) Hêviya Welêt, N. Mayî, kurmançî
- ☐ (3150) Gurî- Zînar Soran, kurmançî
- ☐ (3151) Muzexaney Etnografî Kurd... F. Hafid, bi soranî
- ☐ (3152) Gwêgire Piyawîbîçûk, W. Reich, bi soranî
- ☐ (3153) Dastanî Ruh, F. Gardawan, bi soranî
- ☐ (3154) Ez û Şev û Bêdengî, M. Mayî, kurmançî bi tipên erebî
- ☐ (3155) Dengê Metîn û Cûdî, S. Botanî, kurmançî
- ☐ (3156) Blâs Min Flôjt, H. Yetkin, bi siwêdî
- ☐ (3157) Kolan, R. Bêgerd, bi soranî
- ☐ (3158) Destpêkên Şevînê, M. Zilanî, kurmançî
- ☐ (3159) Balûlka Şekirê, H. Silêvaneyî, kurmançî
- ☐ (3160) Yazarlık ve İdeoloji, Ş. Cizîrî, bi tirkî
- ☐ (3161) Cizira Botanî Bedirhanîler, Malmîsanîj, bi tirkî
- ☐ (3162) Behsen fi el-seradib..., D. Mêqerî, bi erebî
- ☐ (3163) Dîwanî Şêrko Bêkes, cild.3, bi siwêdî
- ☐ (3164) Jinên Kurd..., Rohat Alakom, kurmançî
- ☐ (3165) Dewletî Cumhurî Kurdistan..., M. Ezat, soranî
- ☐ (3166) Heyranok..., Beşîr Botanî, kurmançî
- ☐ (3167) Computer, E. Necmeddîn, bi soranî
- ☐ (3168) Mindalaket bo wa ekat?, Ş. A. Mistefa, soranî
- ☐ (3169) Hareket ul-tehrîr el wetenî ... X. Cindî, bi erebî
- ☐ (3170) General Şerîf Paşa, Rohat Alakom, bi tirkî
- ☐ (3171) Jinenîgarîya Min, Cigerxwîn, kurmançî
- ☐ (3172) Simko, M. R. Hawar, soranî
- ☐ (3173) Cembeli, İhsan Culemêrgî, kurmançî
- ☐ (3174) Kurtemêjûy Bizûtnewe..., S. Şerefkendî, soranî
- ☐ (3175) Marîf wirêne dekat, A. Qeredaxî, soranî
- ☐ (3176) Gulçînînewe, A. Hesenzade, soranî
- ☐ (3177) Berbangên Newrozê, Edip Polat, kurmançî
- ☐ (3178) Hikayetên Civata Kurda, Prof. Hecîyê Çindî, kurmançî

Art.nr. TITEL (Navên kitêban)

- ☐ (3179) Du Heval, Leo Tolstoy, kurmançî
- ☐ (3180) Kurd ve Kurdistan, Dr. Abdul Rahman Ghassemlou, bi farsî
- ☐ (3181) Metamorfoz, Hüseyn Yetkin (bi siwêdî)
- ☐ (3182) Röd Flykt, Sherko Bekas (bi siwêdî)
- ☐ (3183) Kürt Ulusal Hareketleri ve Irak ta Kürdistan İhtilali, S.A. Şivan, bi tirkî
- ☐ (3184) Coğrafyay Kurdistan, Abdulla Ghafor, bi soranî
- ☐ (3185) Rêgûzerî bîrî siyasetî, Sven Erik Liedman, bi soranî
- ☐ (3186) Li rawengeyekî kurdiwa herîşê Xachilgiranê, J. Kurdo
- ☐ (3187) Compûtera ber dilê min, Mahmûd Lewendî, kurmançî
- ☐ (3188) Bonî tarîkî, Ferhad Shakeley, soranî bi tipên erebî
- ☐ (3189) Memik Axa wo dêrsimî, Haydar Işık, dimilî
- ☐ (3190) Rojnama Dicle-Firat hejmar 1-8 (tipkî basim bi tirkî û kurdi)

Pirtûkên zarokan

- ☐ (3300) HÎŞT-HÎŞT li derûdora avê, Petra Szabo, kurmançî
- ☐ (3301) HÎŞT-HÎŞT li mala me, Petra Szabo, kurmançî
- ☐ (3302) SORO lédigere û lédigere, Tord Nygren, kurmançî
- ☐ (3303) SORO diçe semestrê, Tord Nygren, kurmançî
- ☐ (3304) RINDO û ereba çargoşê, Ulf Löfgren, kurmançî
- ☐ (3305) RINDO û orkestra, Ulf Löfgren, kurmançî
- ☐ (3306) RINDO û seyrana, Ulf Löfgren, kurmançî
- ☐ (3307) RINDO Şorbe dide ser, Ulf Löfgren, kurmançî
- ☐ (3308) RINDO û telefon, Ulf Löfgren (kurmançî, soranî)
- ☐ (3309) RINDO û Mişk, Ulf Löfgren (kurmançî, soranî)
- ☐ (3310) RINDO holikê çêdike, Ulf Löfgren, kurmançî
- ☐ (3311) Nêçîra rovî, Sven Nordqvist, kurmançî
- ☐ (3312) Pasteya kiloran, Sven Nordqvist, kurmançî
- ☐ (3313) Rêwîtiya dûr û dirêjê, Rose Lagercrantz (kurmançî, soranî)
- ☐ (3314) Emma û birayê biçûk, Gunilla Wolde (kurmançî, soranî)
- ☐ (3315) Yekemroja Emmayê li kreşê G. Wolde (kurmançî, soranî)
- ☐ (3316) Tûtê xanî çêdike, Gunilla Wolde (kurmançî, soranî)
- ☐ (3317) Tûte paqijiyê dike, Gunilla Wolde (kurmançî, soranî)
- ☐ (3318) Emma diçe ser doktor, Gunilla Wolde (kurmançî, soranî)
- ☐ (3319) Emma diçe ser doktorê diranan, Gunilla Wolde (kurmançî, soranî)
- ☐ (3320) Emma diçe ser doktor, Gunilla Wolde (kurmançî, dimilî)
- ☐ (3321) Emma diçe ser doktorê diranan, Gunilla Wolde (kurmançî, dimilî)
- ☐ (3322) Tûte diçe derwe Gunilla Wolde (kurmançî, dimilî)
- ☐ (3323) Tûte, Gunilla Wolde (kurmançî, dimilî)
- ☐ (3324) Keça Şerrûd Lotta, Astrid Lindgren, kurmançî
- ☐ (3325) Rindo û Şilo, Ulf Löfgren (kurmançî, soranî)
- ☐ (3336) Doktor Rindo, Ulf Löfgren (kurmançî, soranî)

Pirtûkên dersê

- ☐ (3400) Dîroka Kurd û Kurdistanê (sinifên 5-9)
- ☐ (3401) Kurterastî (Coğrafya) (sinifên 5-7)
- ☐ (3402) Kurtemêjûy Kurd û Kurdistan
- ☐ (3403) Kurteyekî Coğrafya
- ☐ (3404) Coğrafya Kurdistanê
- ☐ (3405) Coğrafyay Kurdistan

APEC
Tryck & Förlag

Navnîşana xwestinê li Swêdê:
Apec
Box 3318,
S-163 03 Spånga / SWEDEN
Telefaxnr: +46 8 761 24 90
Telefonnr: +46 8 761 81 18

Navnîşana xwestinê li Almanyayê:
Dilan KITAP-MUZIK
Brigitten str. 3
20359 - Hamburg / DEUTSCHLAND
Telefaxnr: + 49 40 432 906 71
Telefonnr: + 49 40 432 906 70

Ji Weşanxaneyê Apecê 3 kitêbên nû yên zarokan!



Ji zarokên xwe re bi kurdî bixwînin û bidin xwandin!

Navnîşana xwestinê li Swêdê:
Apec-Tryck & Förlag
Box 3318
S-163 03 Spånga/Sweden
Tel: +46 8 761 81 18
Faks: +46 8 761 24 90

Li Almanyayê:
Dilan KITAP-MUZIK
Brigitten str. 3
20359 - Hamburg/Deutschland
Tel: +49 40 432 906 70
Faks: +49 40 432 906 71



- Li welatekî wilo dilkevir divê mirov xwe tazî bike. Divê bi lingê xwe bipeyive yan jî herdu lingan hilde. Kî xwedî namûs e bila bê.

Bila bê lawê min vegerîne.

Piştî dora sîh salî agir bi hepsê ket. Mencolê berî jinên girtiyan li ser laşê şêst girtiyên şewitî rawestiyabû:

- Doh sînema bû. Îro heps e. Xwedê zane sibê dora çi ye?

Bişewitin, bişewitin belkî hûn bêne şûştin, agir tenê incax karibe we paqij bike.

Hîn agirê sînemê nehatiye vemirandin. Ev sîh salê min e ku ez dişewitim. Hîn tola wan zarokan li erdê ye. Canên wan sax in eger hûn bawer nekin jî bibînin.

Mencolê du tilî di devê xwe de tewandin û kir fikînî. Sêsed leşkerên çekdar li ber wê rêzbûn. Bi yek dengî gotin:

- Em amade ne dayê.

Mencolê bi serê lêvan vegerand:

- Niha herin... Heta ez we bixwazim.

Helîm Yûsiv
(mirî ranazin)